AKTORÊN ESASÎ RÛDINÊN

## PYD li Moskovê ye

Di çarçoeya hevdîtinên Rûsya û Sûriyeyê de Rûsyayê PYD dawetî Moskovê kir. Nûnerê PYD'ê yê Fransayê Halît Îsa diyar kir ku dê hevseroka PYD'ê Asya Abdullah û hevserokê kantona Kobanê Enver Mislim dê bi Lavrov re rûnên... R4



# Kobanê bû ruhê neteweya kurd

Li seranserî bajarên rojavayê Kurdistanê hem 3'yemîn salvegera Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Kantona Cizîrê û hem jî 2'yemîn salvegera rizgarkirina Kobanê bi şahî û çalakiyên cihêreng tê pîrozkirin. Li aliyê din sazî û dezgehên kurdistanî jî her du salveger pîroz kirin û got ku Kobanê bûye ruhê neteweya kurd... R5

ROJEVA

Medya

27 Çile În 2017 / e-mail: rojevamedya@hotmail.com / Buha: 1 TL Hejmar: 78



## Xweseriya Rojava bi ser ket

Serokê Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Kantona Kobanê Enwer Mislim der barê 3'yemîn salvegera ragihandina rêveberiya xweser a her sê kantonên rojavayê Kurdistanê de axivî û da zanîn ku tecrubeya rêveberiya xweser piştî rizgarkirina Girê Spî, Minbic û Sirînê, îspat kir ku ev proje mafên hemû pêkhateyan diparêze... R5

# Ji dîktatoriyê re NA

### 'NA' JIYANEKE NÛ YE

Tevgera Jinên Azad TJA'yê li Amedê starta xebatên referandûmê da destpêkirin. Hevparên TJA'yê da zanîn ku tekane daxwaza AKP'ê kûrkirina konsepta şerê li dijî gelê kurd û jinan e û ji bo ku pêşî li şer û mirinan bê girtin, dê TJA jî di nav eniya NA'yê de rol û rista xwe ya pêşengiyê bîne cih.

### TJA'yê bi şiyara 'Ji dîktatoriyê re na' dest bi kampanyaya referandûmê kir

### PÊDIVÎ BI OCALAN HEYE

Hevparên TJA'yê destnîşan kir ku di nav vê rewşa kaotîk de pêdiviya hemû aliyan bi fikr û ramanên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan heye û dê kampanyaya xwe ya ku ji bo azadiya Ocalan dabûn destpêkirin, bi kampanyaya referandûmê re bikin yek... RÛPEL -2






## Suryaniyan got bêyî Ocalan nabe

Pêkhateyên kurd û suryanî yên herêmên Dêrikê û Girkê Legê yên rojavayê Kurdistanê ku beşdarî meşa ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bûn, têkildarî tecrîda ku hikumeta tirk li ser Ocalan pêk tîne nerazîbûnên xwe anîn ziman. Di çalakiyan de peyama bêyî Ocalan jiyan nabe hat dayîn... RÛPEL - 7



## Ferhat ji nexweşan re dibe hêvî

Zarokê bi navê Ferhat Kaya yê li girtîgeha Edeneyê ku li qawîşa wan şewat derket û hêj di bihara emrê xwe de ji ber zext û pêkutiyên dewletê jiyana xwe ji dest da, dê bi organên xwe ji bo hin mirovên din bibe hêvî. Malbatê organên Ferhat ji bo nexweşan bexşandin... RÛPEL - 3



## Welatê mirov warê mirov e

Malbata Zilfet Heybetoglu ya di dema qedexeya derketina kolanan de ji taxa Firatê ya Nisêbînê koçî Stenbolê kir, piştî dorpêç bi dawî bû, ji Stenbolê vegeriya warê xwe. Malbatê da zanîn ku wan hemû rojên xwe yên li Stenbolê bi hesreta vegerê derbas kirine û got ku bêyî welat jiyan nabe... RÛPEL - 3


### Cînayeta berhema aqilê hevpar... Sarya Denîz R2


LI DIJÎ KURDAN ÊRÎŞA SÎSTEMATÎK

## Ewilî digirin paşê qeyûm dişînin

**Hikumeta tirk ji bo şikandina rûmeta gelê kurd bi rêya polîs û daraza xwe qirkirina siyasî ya li Bakur didomîne**

Êdî êrîşên AKP'ê bûne êrîşên sîstematîk. AKP'a ku di hilbijartinan de li Kurdistanê bû partiya tabelayê, bi zora polîs û leşkerên xwe îradeya gel binpê dike û şaredariyan dagir dike. Lê ji ber ku ew jî pê dizane ku vê yekê bi hikmê zorê pêk tîne, di nav tirs û xofeke mezin de ye... R.6






## Esnafî nêşînî karê xo bikerî

Serekê Odaya Esnaf û Hunermendan Îrfan Sarîyî wina va: "Nika Berê Sînorî yê Esendere de kar nêbeno. Seba ke polîtîkayê şerî yenê meşnayîş, krîzê Geverî her ke şono hîna zaf kûr beno." ... RÛPEL - 11

## Mergê 12 kesan beno babeta bazarî

Goreyê îzeheto ke keyepelê Şaredarîya AKPyî ya Bayrampaşa ser ro ameyo parekerdiş, erazîyê Hepisxaneyê Bayrampaşa de awanîyî yenî viraştiş. Labelê reklamê nê awanîyan ser operasyonê bi nameyê 'Agêrayîşê Cuye' ke 19ê kanûna 1999 de amebî kerdiş û netîceyê operasyonî de 12 hepsîyî merdbî ro yeno kerdiş... RÛPEL - 11



www.rojevakurdi.org

## ‘Xwezî jinan welat bi rê ve bibira’



**DÎLEK DEMÎR** (42) a keyaya taxa Muradiyê ya Baglara Amedê, ev 28 sal e li vê taxê dijî û sê sal e keya ye. Demîr li hemberî zor û zehmetiyan tê dikoşe. Demîr têkildarî keyatiya xwe axivî û diyar kir ku ji roja bûye keya heta îro gelek tişt guherîne û bi taybet jî ji bo jin û zarokan û wiha got: “Beriya keyatiyê jî ez li taxê diçûm alîkariya her kesî. Ez bi jinên pîr û yên xwendina wan tune re diçûm TEDAŞ û DÎSKÎ’yê. Dema min got ez dibim namzed gelek piştgirî dan. Gelê Muradiyê piştgiriyeke mezin da. Taxa me pir ne mezin e, 20 hezar nifûsa wê heye.” Demîr li gel 6 mêran ketiye hilbijartinê û bi ferqa 159 dengan bûye keya û wiha axivî: “Gelê Muradiyê xizan e. Hîna xaniyên ax hene. Gelek betal hene. Çi ji destê min tê ez dikim. Mixabin hîna ji bo jin û ciwanan qadên xebatê tune ne. Min bi piştgiriya şaredariyê rêyên taxê hemû çêkirin. Li gel vê 15 projeyên me çêbûn. Xwezî welat jî ji aliyê jinan ve bihata birêvebirin. Keyatî ne tenê li ser maseyê rûniştin e. Gel ez hilbijartime û divê ez jî pewyira xwe bînim cih.” **AMED - ŞÛJIN**

# ‘Ji dîktatoriyê re na’

**TJA’yê bi şiyara ‘Ji dîktatoriyê re na’ dest bi kampanyayekê kir. TJA’yê destnîşan kir ku pêwîstiya jinan herî zêde bi lêgerînên çareseriyê yên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan heye**




Tevgera Jinên Azad (TJA), bi dirûşma “Em ê teqez bi Rêbertiyê re bi ser bikevin” li Salona Konferansê ya Vedat Aydin a DBP’ê ya Amedê aşkera kir. Hevberdevka HDK’ê Gulistan Koçyîgît, parlamenterên HDP’ê yên jin, hevseroka DBP’ê ya Amedê Rûken Akça, meclisa Dayikên Aştiyê, rêveberên DBP’ê yên bajar û navçeyan beşdarî civînê bûn. Deklarasyona kampanyayê ji aliyê aktîvîsta TJA’yê Ayşe Gokkan ve hate xwendin. Gokkan diyar kir ku Tirkiye ketiye nava lîstikeke bixwîn û bêrehm û wiha got: “Ev siyaset, siyaseta qirkirin û zilmê ye ku serxwebûna Tirkiyeyê di tunekirina kurdan de dibîne.”

Gokkan anî ziman ku di vê demê de bajar hatine xerakirin, jinên kurd koçber bûn, ji kar hatin derxistin, sazî hatin girtin; rewşenbîr, akademîsyen û parlamenterên jin hatine binçavkirin, girtin û işkencekirin û wiha got: “Bi weşandina dîmenên înfaza jinan, êrîşa zayendî bi rengekî bêexlaq radixe pêş çavan. Bi rêya kuştina jinan hebûna xwe diparêze û bi rengekî organîzeyî êrîşî rêbaza jiyanê ya jinan dike.” Gokkan destnîşan kir ku herî zêde pêwîstiya jinan bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan heye û ev tişt anî ziman: “Ev yek ji bo me jinan, tê wateya parastina azadî û têkoşînê. Ev, bersiva li ser rêbaza jiyana me ye. Em dixwazin li komara demokratîk a ku xwe dispêre yekitiya neteweya demokratîk de bijîn. Yekane rêya pêkhatina vê jî, azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û naskirina mafên bingehîn ên gelê kurd e. Lewma em bang li hemû jinan dikin ku tev li vê têkoşîna birûmet bibin.”

**KONSEPTA NÛ**

Di deklarasyonê de ev bang li raya giştî ya Tirkiyeyê hat kirin: “Hinceta yekane ya pergala serokatiyê ku desthilatdariya AKP’ê xistiye rojevê, konsepteke nû ya şerê li dijî gelê kurd e. Ji ber vê yekê, rêya bingehîn a pêşîlêgirtina li rejîma dîktator û ewlekirina nirxên komara demokratîk, çareserkirina pirsgirêka kurd e. Ji bo jiyaneke nû, aştiyeke nû pêwîstî bi azadiya Rêberê Gelê Kurd birêz Abdullah Ocalan, nêrînên wî heye. Dê eniya ‘na’yê pêşî li komkujiya jinan û gelan bigire.” ***AMED - ANF***

## ‘Em ê teqez bi ser kevin’

**DI DEKLARASYONÊ** de hat diyarkirin ku dê li ser vê bingehê TJA bi daxwaza ‘Ji Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka kurd re çareseriya demokratîk’ têkoşîna xwe geş bike û ev tişt hat gotin: “Tevî hemû komkujî, esaret, îşkence û êrîşên li me hatine kirin, em jê bawer in ku rastî dê ji sedî sed bi ser bikeve. Tu hêz nikare azadiya me, serhildana ku me li zindanan, çiyayan û kolanan mezin kirine, ji me bistînin. Li ser vê bingehê em ê qonaxa duyemîna ya kampanyaya xwe ‘Xwedî li Rêberê xwe, axa xwe, azadiya xwe derdikevim’ bi navê ‘Bi Rêbertî re em ê ji sedî sed bi ser bikevin’ bidomînin. Em ji dil dizanin ku dê efendî, zalim û dîktator têk biçin. Em wek jinên TJA’yî kampanyaya ‘Ji dîktatoriyê re na’ didin destpêkirin û dibêjin, azadî dê ji sedî sed bi ser bikeve.”

## ‘Divê jin şopdarên dozê bin’



Doza der barê qetilkirina sê jinên şoreşger Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemezê de hat xistin. Sedem jî mirina tetikkêş Omer Guney hat nîşandan. Endama HDP’ê ya Stenbolê Sebahat Erdogan bal kişand qetilkirina her sê jinên şoreşger û diyar kir ku her kes dizane ku ev komkujî Omer Guney tenê kiriye û divê berpirsên komkujiyê bên darizandin.

**SEMBOL TÊKOŞÎNÊ BÛN**

Erdogan da zanîn ku her sê siyasetmedarên jin ên hatine qetilkirin rêhevalên wan ên têkoşîna li Tirkiyeyê ne, loma bi vê komkujiyê nasname û têkoşîna kurdan hedef hatiye girtin û ev tişt anî ziman: “Divê pêvajoya beriya komkujiyê jî bê dîtin. Her sê hevalên şoreşger têkoşîna jinan anîbûn asteke gelek girîng. Di şexsê wan de têkoşîna jinên azad a li Tirkiyeyê û cîhanê hedef hat girtin. Omer Guney tetikkêş bû. Her kes vê yekê pir baş dizane. Em bawer nakin ev kes bi tena serê xwe ev komkujî pêk anî be û piştre ji ber nexweşiyê dimire. Li pişt vê komkujiyê hêzên tarî hene.”

Gulistan Erdogan herî dawî bang li jinan kir ku divê şopdarên doza her sê jinên şoreşger bin û heta ku doz were ronîkirin xwedî lê derbikevin. **STENBOL - ŞÛJIN**

## Ji bo yekitiyê dicivin



**DI MEHA** cotmeha 2016’an de jinên kurd li tevahiya Tirkiyeyê û Kurdistanê kampanyaya “Em xwedî li ax, av, xweza û Rêbertiya xwe derdikevin” dabû destpêkirin. Tevgera Jinên Azad a Êlihê jî di çarçoveya kampanyayê de dê di 28’ê çileyê de bi jinan re dê bê cem hev. Endama komîteya amedekariyê ya bernameyê Gulistan Erdînç der barê armanca civîna jinan de axivî û diyar kir ku jina ku ne azad be, nikare xwedî li ax, av, xweza û Rêbertiya xwe jî derkeve.

Erdînç anî ziman ku ew wek jinên Êlihê ev salek e xebatên ji bo kampanyayê dane destpêkirin û wiha got: “Wekî tê zanîn jinên kurd di pêvajoyê de rastî gelek êşan hatin. Jinên Êlihê bi her awayî bedel dan. Piştî tayînkirina qeyûman gelek navendên jinan hedef hatin nîşandan û girtin. Li hemberî van êrîşan pêwîstî bi yekitî û têkoşîneke xurt a jinan heye, em li ser vê esasê tên gel hev. Jin heta azadiya xwe bi dest nexe, nikare di civakê de bijî û bibe xwedî statu. Ji ber vê yekê em ê yekitiya jinan ava bikin.” Erdînç herî dawî hemû jinên Êlihê vexwendin bernameya li eywana dawetê ya Rozayê û got ku divê hemû jin xwedî li vîna xwe derkevin. **ÊLIH - ŞÛJIN**

## Cînayeta Berhema Aqilê Hevpar

**Destar**
Sarya Denîz

Dema ku gotin tê ser kurdan aqilê hevpar dikeve dewreyê. Cînayeta siyasî ya li Parîsê karê vî aqilî ye. Paşxaneya qetilkirina 3 jinên şoreşger bi hewldaneke taybet tê veşartin. Ev yek nîşan dide bê ka ev cinayet ji hêla kê ve û çawan hatiye pêkanîn.

Der barê cinayeta Parîsê de Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi van gotinan tespîteke berbiçav dikir: “Ji 1976’an ve PKK her tim bi van komployan re rû bi rû bûye. Ez ji ber wê hişyar dikim. Hê jî di vê derê de min wek enstrumantal û amûr dibînin. Ez dibêjim ev xeternak e. Tiştên ku li ser min dibêjin tu girîngiya xwe tune ye. 30 sal e der bar min de operasyonên têgihanê bi rê ve dibin. Ev jî ji bo min qet ne muhîm e. Ji ber ku dîrok min piştrast dike. Li Parîsê operasyoneke têgihanê ya nû tê kirin. Sûîkasta Sakîneyê wisa tiştekî ji rêzê nîn e. Bi awayekî pir planî hate kirin. Ji bo min sedema şer bû. Sûîkasta Sakîneyê ji bo me ji sûîkasta weliahtê Awusturyayê ya di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de jî girantir bû. Ji xeynî min tu kesî di wan şert û mercan de nedikarî ji nav wî şerî derkeve. Ji ber ku min ev hemû dîtin, her çend giran be jî, min xebata xwe ya li vir berdewam kir.”

Mirina kujer Omer Guney û piştî ku doza der barê vê cinayetê de ket, rastiya tespîtên li jor ên berbiçav baştir tê fêmkirin. Bêguman heke mirov li bendê bimîne ku ev cînayet ji aliyê failên wê ve were zelalkirin, dê bibe xeletiyeke herî mezin.

Di pêvajoyeke wisa de ku der barê çareseriya pirsgirêka kurd de rûdanên gelekî girîng çêdibûn, pêkanîna cinayeteke wiha pir tevlihev e. Aqilê hevpar ê ku qenciya kurdan naxwaze di vir de ketiye dewreyê. AKP’ê got ku ev cinayet ji hêla Cemaetê ve hatiye kirin û xwest xwe jê safî bike. Niha jî xuya dibe ku karê zelalnekirina cinayetê hildaye ser milê xwe. Ne tenê ji vê cînayetê, ji gelek cînayet û komkujiyên wekî vê cinayetê em fêm dikin ku ji bo dijminahiya kurdan aqilê hevpar bi çi awayî derdikeve ser kar.

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tîne ziman ku ev cinayet ne tenê karê Cemaet û MÎT’ê ye, her wiha tiliya hêzên navneteweyî jî tê de heye: “Heke li benda Cemaetê bimaya, niha PKK dê tarûmar bibûya. Baransu wê demê di rojnameya Tarafê de nivîsîbû: ‘Heke 21 kadroyên pêşeng en bibandor ên PKK’ê werin îmhakirin, dê mesele çareser bibe.’ Va ye Sakîne yek ji wan e. Hê jî yên din dixwazin bikin. Liseteyeke girîng çêkiribûn, wekî lîsteya karsazan a di salên 90’î de, wekî lîsteya Çillerê. Di demên berê de planên MÎT’ê jî yên wiha hebûn. Mirov dikare serdema Teoman Koman bibêje.”

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan aliyên cînayetê yên navneteweyî jî wiha dinirxîne: “Florîda navenda konrtgerîla ye. Abdullah Çatli du caran çû wê derê. Sûîkasta Papa û cinayeta Palmeyê pêk hatin. Cînayeta Sakîneyê jî karên van komên wiha ye. Gladîoya nû baş nayê fêmkirin. Komployeke navend-Washington e ku di ser CIA û Gladîoyê re hatiye pêkanîn. Hişmendiya min a dîrokê heye, ez bi rastiya dewleta kûr dizanim. Her tiştê ku ji bo çareseriyê hate kirin, sabote kirin. Bûyera Sakîneyê li ser min tereduteke mezin çêkir. Ne safî ye. Sakîneyê li Ewropayê aştî temsîl dikir. Qetlîam hê jî nehate zelalkirin.”

Mirov ji van hemûyan fêm dike ku ev cînayet wisa bûyereke ji rêzê nîn e. Her çend hinek aliyên wê zelal nebûbûn jî xuya ye ku îstixbarata Tirkiyeyê û ya Fransayê beriya vê cînayetê her tişt plan kiriye û ev plan xistin dewreyê. Lê belê ev plan nikarin rastiyê veşêrin. Ev cinayet berhema aqilê hevpar ê dijminê kurdan e.

www.arsivakurd.org

ROJEVA Medya
27 Çile 2017 În

# Dîsa vegeriyan warê xwe

**Malbata Zilfet Heybetoglu a di dema qedexeya derketina kolanan de ji taxa Firatê ya Nisêbînê koçî Stenbolê bûn, piştî dorpêç bi dawî bû dîsa vegeriyan warê xwe Nisêbînê**

DÎCLE MUFTUOGLU/AYNUR ÎNEDÎ / MÊRDÎN - DÎHABER


Welatiyên Nisêbîna Mêrdînê ku ji salekê zêdetir e qedexe û dorpêça taxan lê didome, bi her awayî li ber xwe didin. Malbata Zilfet Heybetoglu a di dema qedexeya derketina kolanan de ji taxa Firatê ya Nisêbînê koçî Stenbolê bûn, piştî dorpêç bi dawî bû, nekarîbûn li Stenbolê bijîn û dîsa vegeriyan warê xwe Nisêbînê.

Zilfet Heybetoglu anî ziman ku ji ber ku nekarîn li taxeke din xanî kirê bikin û hevjînê wê ji kar hat derxistin, koçî Stenbolê kir û wiha got: “Min ji hevjînê xwe re got ji bo demeke kurt em biçin Stenbolê, dibe ku em li wir karekî jî bibînin. Em ji bo demeke kurt çûn. Lê me nekarî li Stenbolê bijîn. Me nekarî dûrî Nisêbînê bijîn, piştî şer bi dawî bû, em dîsa vegeriyan. Dema em ji Nisêbînê çûn Stenbolê mirovan nekarîbû cil alavên xwe derxin û ji taxên xwe derdiketin.”

Heybetoglu, diyar kir ku dema ji Stenbolê vegeriyan Qoserê tenê walîzekî wan hebû û wiha got: “Piştî bi awayekî qismî qedexeyên li Nisêbînê rabûn em dîsa hatin Nisêbînê. Em niha li taxa Yeşilkentê li qateke jêrzemînê bi cih bûne. Ji ber ku hêj der û dora taxa me bi têlan hatiye dorpêçkirin em nikarin biçin mala xwe. Em nikarin alav û amûrên xwe wergirin. “

Heybetoglu da zanîn ku niha dibêjin dê jîngehan bidin wan û wiha got: “Ne pere û ne jî zeviyan didin me. Dibêjin ‘em dê jîngehan bidin we.’ Kî dê di jîngehên wan de bijî. Donimek zeviya me hebû.
Xaniyê me duqat bû.
Ez li qatekî û tiyê min li qatekî bû.
Heke daîre bidin jî ew bax û darên me dê lê bên? Dê bikarin wan bîranînên me bidin me? Niha hevjînê min karê bi yewmiye dike. Hin rojan kar heye hin rojan ker tune ye. Yewmiye 30 TL ye. Ev pere bi zorê têra lêçûnên me dike.

Heybetoglu da zanîn ku welatiyên dixwazin biçin malên xwe alav û amûrên xwe bînin jî bi diziyê tên tawanbarkirin û anî ziman ku ew bi armanca xaniyê mayî neyê xerakirin her roj diçin li ber taxê nobedê digirin.



## Organên Kaya dê jiyana gelek kesan xelas bike



Cenazeyê zarokê 17 salî Ferhat Kaya yê di encama şewata li koguşa zarokan a Girtîgeha Tîpa E ya Edeneyê laşê wî hemû şewitî û li nexweşxaneyê dihat dermankirin û du roj berê jiyana xwe ji dest da, ji aliyê malbatê ve piştî karên otopsiyê ji Saziya Tiba Edlî hat wergirtin. Malbata ku cenazeyê Kaya wergirt, destpêkê birin malê û piştre jî ji bo cenaze defin bikin birin Goristana Kabasakalê. Piştî wecîbeyên olî, cenazeyê Kaya hat definkirin.

Li aliyê din hat zanîn ku malbatê organên Kaya bexşî Navenda Koordînasyona Organan a girêdayî Wezareta Tenduristiyê kirine. Tedawiya zarokê girtî yê bi navê Mehmet A. yê ku di şewatê de bi giranî birîndar bû û ya 2 memûrên girtîgehê jî berdewam dike.
***EDENE - DÎHABER***

## Gefa kuştinê li girtiyan dixwin

Li girtîgehên Kurdistan û Tirkiyeyê her roj mafên girtiyan tên qedexekirin û hemû aktîvîteyên wan tên astengkirin.

Li gel van binpêkirinên mafan jî îşkence û êrîşên li dijî girtiyan derketine asta herî jor.

Di rojên dawîn de ji gelek girtîgehan agahiyên xeternak tên û ev rewş hemû ewlehiya canê girtiyan a ku di bin metirsiyê de ye, derdixe holê.

**GIRÊKA PAŞPÊKÎ**

Her wiha li girtîgehan pêkanînên îşkenceya salên 1980 û 1990’î derketin holê û wehşeta wan salan di demên dawîn de xwe dubare dike. Yek ji van binpêkirin û îşkenceyan jî li Girtîgeha Tîpa T a Wanê pêk tê.

Girtîgeha Tîpa T a Wanê ya ji beriya niha bi îşkenceya bi rêbaza ‘girêka paşpêkî’ ket rojevê, niha li girtiyên siyasî gefa kuştinê tê xwarin.

Endamên Komîsyona Girtîgehan a ÎHD’ê diyar kir ku li girtîgehên Wanê sûcê li dijî mirovahiyê tê kirin û got: “Li girtiyan îşkenceya ‘girêka paşpêkî’ tê kirin, gefên kuştinê li wan tên xwarin.”
***WAN - ANF***

## Li Edeneyê cenazeyên 3 kesan hatin dîtin

Li goristana taxa Alîhocali ya navçeya Yuregîra Edeneyê cenazeyên 3 zilamên ku bi çekên lûledirêj hatine kuştin, hatin dîtin.

Polîs û koma tenduristiyê ku li ser giliya welatiyan ku wesayît di nava goristanê de dîtin, hatin cihê bûyerê. Hat diyarkirin ku wesayîtê li stûnê xistiye û rawestiyaye, zilamek di nava wesayîtê de, yê din ji deriyê wesayîtê ketiye xwarê û yekî din jî 10 metre dûrî wesayîtê hat dîtin. Hate zanîn ku ji kesên mirî Refîk Bîngul û Ufuk Altun temîrkarê wesayîtan, Eser Bînen jî xwendekarê zanîngehê ye. Cenaze ji bo otopsiyê rakirin Saziya Tiba Edlî û der barê bûyerê de lêpirsîn hat vekirin.
***EDENE - DÎHABER***

## Serlêdana ji bo Rozerînê hat redkirin

Rozerîn Kalkan a ku ji girtîgeha Tîpa E ya Mêrdînê sirgûnî Girtîgeha Tîpa E ya Nîgdeyê hat kirin, parêzerên wê serî li Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) da. Parêzerê ku ji bo Rozerîn serî li DMME’yê da, wiha got:



“DMME’yê bî hinceta ku tedbîr tenê di warê dersînorkirinê de û di dema xetereya jiyanê de tê dayîn, serlêdan red kir.”

Rozerîn Kalkan a ku di girtîgehê de bi îşkenceyê re rû bi rû ma û piştre jî bêyî ku ji malbata wê re ragihînin ew ji Gîrtîgeha Tîpa E ya Mêrdînê revandin Girtîgeha Tîpa E ya Nîgdeyê, bi mahan e ku di hucreya yekkesî de dimîne. Ji bo Rozerîna ku li girtîgehê bi îşkenceya fîzîkî û ya zayendî re rû bi rû ma û bi êrîşa zayendî ku li dijî wê hat kirin, bi zorê pê îfade dan îmzekirin, serlêdanên ku berê der barê wê de dihatin kirin, hemû hatin redkirin. Ji ber vê bêçaretiyê parêzerê Rozerînê serî li DMME’yê da û daxwaza tedbîrê li DMME’yê kir, lê DMME’yê jî serlêdan red kir. ***AMED - ŞÛJIN***

## Zivistanê nikarin li taxa xwe bijîn



Li Semsûrê, Taxa Olîorte ya ji 20 xaniyan pêk tê, di demsalên payîz û zivistanê de ji ber qeşayê, girtina rêyan û tunebûna dibistanê vediguhere averêyê. Niştecihên taxê yên zivistanan li bajaran bi cih dibin, havînan dubare vedigerin.

Keyayê Olîortê Kamber Tunç ê ku 13 sal e keyayê taxê ye, anî ziman ku ew zivistanan neçar dimînin ku taxê biterikînin û wiha domand: “Zivistanan li taxa me pirsgirêka avê heye. Ava me ya vexwarinê ji 2 hezar û 600 metreyî tê. Bi boriyên plastîk ên di sala 1960’î de hatine bicihkirin tê veguhastin. Ji ber ku boriyên avê sererd in, zivistanan av bi temamî dibe qeşa. Em seranserê zivistanê rastî tengasiya avê tên. Ya duyemîn jî rêyên me xerabe ne. Dema berf dibare, şaredarî rêyên me vedike, lê belê vê carê jî ji ber heriyê astengî derdikeve. Pirsgirêka heriyê jî ya berfê zêdetir e.”

Tunç diyar kir ku ji bo pirsgirêka wan a avê û rê çareser bibe wan serî li şaredariya bajarokê daye, lê belê derfetên şaredariyê tune ne û got ku li ser vê wan îdareya taybet a bajêr, qeymeqamtî û walîtî jî di nav de serî li gelek saziyên fermî daye, lê belê tu kes ji derdê wan re nebûye derman.
***SEMSÛR - DÎHABER***

www.arsivakurd.org

## Kazakistan dev ji nexweşiya Erdogan berda!

**DI VAN ROJAN DE** ku Tirkiye dixwaze derbasî pergala serokatiyê bibe, Kazakistana ku ji hevdîtinên Astanayê re malovanî kir, ji pergala serokatiyê derbasî pergala parlamenter dibe. Serokdewletê Kazakistanê Nursultan Nazarbayev der barê mijarê de axivî û destnîşan kir ku bi armanca xurtkirina rola parlamentoyê û hikumetê dê li welatê xwe guhertina pergalê pêk bîne û ji pergala serokatiyê derbasî pergala parlamenteriyê bibe. Nazarbayevê ku 26 sal e welatê xwe bi pergala serokatiyê bi rê ve dibe, aşkera kir ku dê di makeqanûna Kazakistanê de reformê pêk bîne û bi armanca xurtkirina parlamentoyê derbasî pergala parlamenteriyê bibe. ASTANA



# Babê hesab xera kir

**Nûçegihanê Independentê yê Rojhilata Navîn Patrick Cockburn di gotareke xwe de bal kişand ser gotina Erdogan a ku ji bo Babê gotibû "Hatiye dorpêçkirin, kêm maye biqede" û got ku TSK'ê li Babê windahiyên mezin dan**



Tirkiye ku di 24'a Tebaxa 2016'an de di ser Cerebluseê re mudaxeleyî Sûriyeyê kir, her ku diçe bedela mudaxeleya xwe girantir dide. Di çarçoveya Operasyona Mertala Firatê de ku hêzên taybet ên girêdayî TSK'ê tevî komên OSO'yê li hemberî Babê operasyon da destpêkirin, tê gotin ku ji ber vê yekê Tirkiyeyê windahiyên gelek mezin dan.

Di Operasyona Mertala Firatê de, windahiyên TSK'ê cara yekemîn di 6'ê îlona 2016'an de çêbûn. Li gorî daxuyaniya TSK'ê windahiyên herî dawîn du roj berê çêbûn. Di pevçûna ku li dora Babê pêk hat de, 5 leşkerên TSK'ê jiyana xwe ji dest da. Piştî van windahiyan, bi giştî heta niha 53 leşkerên TSK'ê jiyana xwe ji dest daye.

**OPERASYONA BAB'Ê**

TSK ku bêyî pevçûn ket Cerablusê, di 10'ê kanûnê de li hemberî bajaroka Babê ku ciheki stratejîk e û girêdayî Helebê ye, operasyon da destpêkirin. Berî ku operasyon bê destpêkirin, di êrîşa ku ji aliyê balafirên Sûriyeyê de pêk hat, 3 leşkeran jiyana xwe ji dest da. Piştî ku operasyon hat destpêkirin, di roja 12'emîn de 16 leşker hatin kuştin.

Piştî windahiyên mezin, di 23'yê kanûnê de serokomar Tayyîp Erdogan got "El Bab hatiye dorpêçkirin, kêm maye ku operasyon biqede".

Lê hê jî TSK û OSO nikarin bikevin Babê. Her wiha DAIŞ'ê 2 leşkerên tirk bi şewitandinê kuştin.

Her wiha windahiyên Tirkiyeyê yên di Babê de di çapemeniya cîhanê de jî cih girt.

Nûçegihanê Independentê yê Rojhilata Navîn Patrick Cockburn di gotareke xwe de wiha dibêje: "TSK windahiyên pir mezin dan ku qet ne li bendê bû. Piştî bi piştgiriya têkiliyên dîplomatîk ên Rûsya û Îranê, Tirkiye hêj li ser Sûriyeyê bi bandor bû. Lê tê dîtin ku li Babê Tirkiye windahiyên mezin dide." *AMED*



## Trump herêmên ewle ava dike

Serokê Amerîkayê Donald Trump dûrketina ji polîtîkayên selefê xwe Barac Obama berdewam dike. Trump der barê penaber û aloziya Sûriyeyê de axivî û da zanîn ku Yekitiya Ewropayê (YE) bi qebûlkirina bi milyonan kesên ku ji Rojhilata Navîn û bi taybetî ji Sûriyeyê koçber bûne, şaşiyeke mezin kiriye û ew ê ji bo ewlehiya welatê xwe nekeve vê şaşiyê.

Trump di berdewama axaftina xwe de destnîşan kir ku ji bo ewlehiya welatê xwe, di rojên pêş de teqez li Sûriyeyê 'Herêmên bi ewle' ava bike.

Hat ragihandin ku der barê mijarê de biryarnameyeke hatiye amadekirin û ji bo ku bikeve meriyetê li benda Îmzekirina Trump e. Li gorî agahiyên ku ji Reutersê hatin bidestxistin di biryarnameyê de ji bo wezaretên parastin û karên derve yên Amerîkayê ferman hatiye dayîn ku piştî îmzekirina biryarnameyê, di nav 90 rojan de'Herêmên bi ewle'ava bikin. Ev helwesta Trump rê, li ber fikarên ku Amerîka derstwerdanên xwe yên leşkerî yên li Sûriyeyê zêde bike, vekir.

Li aliyê din li ser navê Rûsyayê Berdevkê Kremlînê Dmîtriy Peskov der barê vê daxuyaniya Trump de daxuyaniyek da. Peskov Trump hişyar kir û got ku divê ev plan rewşa koçberan zehmettir neke û hemû encamên gaveke wiha baş bê fikirîn. *WASHINGTON*





## Trump biryara dîwar lêkirinê da

**SEROKÊ AMERÎKAYÊ** Donald Trump soza xwe ya ku di dema hilbijartinan de ji bo girtina sînorê Mesîkayê dabû, bi cih anî.

Trump di serdana xwe ya Wezareta Ewlekariya Navxweyî de biryara lêkirina dîwarê li seransere sînorê Meksîkayê îmze kir.

Berdevkê Qesra Spî Sean Spicer der barê îmzekirina biryarê de agahî dan û diyar kir ku biryar bi armanca astengkirina kesên ku dixwazin bi awayekî qaçax derbasî Amerîkayê bibin, hatiye îmzekirin.

**MEKSÎKA PERE NADE**

Serokdewlete Meksîkayê Enrique Pena Nieto piştî îmzekirina biryara dîwarlêkirina li sînorê Meksîkayê axivî û bi awayekî tund bersiva Trump da û aşkera kir ku dê ji bo lêkirina dîwar pere nerazîne.

Serokdewlet Nieto diyar kir ku baweriya Meksîkayê bi astengkirina dîwaran tune ye û ev tiştê anî ziman: "Ji ber vê yekê vê helwesta Trump rexne dikim û Meksîka ji bo avakirina tu dîwaran pereyan nade." AMED

## Guhertina makeqanûnê nirxandin

HUSEYÎN ELMALI / STASBOURG - ANF

**Li Meclisa Parlamenteran a Konseya Ewropayê (MPKE) ji aliyê Koma Yekitiya Çepgir ve li ser rêveçûna heyî ya Tirkiyeyê bi beşdariya serokê berê yê Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) dadger Jean Paul Costa, dadgerê berê yê DMME'yê Riza Turmen û parlamenterê HDP'ê yê Mêrdînê Mîthat Sancar panelek hat lidarxistin. Panel bi sernavê "Dîktatorek tê afirandin, an jî demokrasî tê xurtkirin" pêk hat.**

Di panelê de hiqûqnas û dadger Jean Paul Costa axivî û diyar kir ku di guhetina Makekanûna Tirkiyeyê de beşa mezin a hêzên rêveberî, qanûndanîn û dadgerî di destê şexsekî de kom dibe û wiha got:"Welatên di mijara azadî û mafên bingehîn de bi berpirsyariya endametiya Konseya Ewropayê ranabin, divê bên hişyarkirin. Ger ku hûn ji ber berjewendiyên realpolîtîk an jî fînansî çavên xwe li hin dewletan bigirin ku berpirsyariyên xwe bi cih nînin, hingî hin dewletên din jî wê bidin ser şopa wan."

Parlamenterê HDP'ê yê Mêrdînê Mîthat Sancar jî ji ber ku di civînên MPKE'yê de rewşa li Tirkiyeyê neyê nirxandin bi rexnekirina MPKE'yê dest bi axaftina xwe kir û wiha pê de çû: "Helwesta Ewropayê dê gef li Ewropayê jî bixwe ger ku Tirkiye hêj bêhtir ji azadiyan dûr bikeve, berdêla vê yekê ne tenê Tirkiye û dê derdora wê jî bide. Di vir de berpirsyariya Konseya Ewropayê heye. Berpirsyariya saziyên Ewropayê ew e ku nirxên ew li ser ava bûne biparêzin."

Turmen jî di axaftina xwe de bal kişand ser rewşa referandûma guhertina Makekanûnê û ev tişt anî ziman:"Bi guhertina Makukanûnê re dê hemû hêz di destê şexsekî de bên komkirin." Turmen tayînkirina qeyûman a ji bo şaredariyên DBP'ê jî wek guhertineke pergalî bi nav kir.

## Rûsyayê PYD vexwend Moskovê

Rûsyaya ku ji hevdîtinên Astanayê re garantorî kir hewldanên xwe yê yên ji bo bidawîbûna aloziya Sûriyeyê berdewam dike. Piştî hevdîtinên Astanayê dê îro Wezîrê Karên Derve yê Rûsyayê Sergey Lavrov bi armanca çarserkirina aloziya Sûriyeyê bi nûnerên hemû hêzên muxalîf ên Sûriyeyê re civîneke li dar bixe.

Rûsya cara yekemîn di çarçoveya çareserkirina aloziya Sûriyeyê de heyeteke PYD'ê ya ku ji Hevseroka PYD'ê Asya Ebdullah û Nûnerê PYD'ê yê Fransayê Xalid Îsa û Serokê Meclîsa Rêveber a Kantona Kobanê Enwer Muslim pêk tê vexwend Moskovê.



Nûnerê PYD'ê yê Fransayê Xalid Îsa der barê vexwendina wan de axivî û piştrast kir ku ew çar roj beriya niha hatine vexwendin. Îsa diyar kir ku wan vexwedinê pejirandine û ew ji bo civînan li Moskovê ye.

Îsa got ku dê îro saet di 09.00'an de bi awayekî fermî bi Wezîrê Karên Derve yê Rûsyayê Sergey Lavrov re hevdîtin pêk bînin. Îsa da zanîn ku ew ê di hevdîtina bi Lavrov re Civîna Cenevreyê ya kut ê payîn di 8'ê sibatê de bê lidarxistin gotûbêş bikin. *PARÎS*

www.arsivakurdi.org

# Qeyûm hat proje erê kirin

**Pêşnûmaya tramvayê ya beriya çend salan Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê ji bo wê bûdçeyek veqetandibû, lê bi salan ji aliyê serokwezîrtiyê ve nedihat erêkirin, piştî tayînkirina qeyûm hat erêkirin**



Pergala Raya Sivik a dê ji 18 rawestgehan pêk bê, etaba wê ya yekemîn bi dirêjahiya xwe ji 14 kîlometretan ji Deriyê Çiyê dest pê dike heta Nexweşxaneya Perwerdehî û Lêkolînê, etaba wê ya duyemîn jî ji Dîclekentê heta Beşyuzevlerê hatibû plankirin. Pêşnûmaya ku dihat payîn dê bi 30 vagonî bixebite, li gel hemû amadekariyên wê temam bûbûn ji aliyê hikûmetê ve wê demê hatibû astengkirin.

Endamê Meclisa Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê û Serokê Komîsyona Gihaniyê Mustafa Emrah ê bi salan li ser pêşnûmayê xebitî, girîngiya pêşnûmayê axivî. Emrah, got pêşnûmaya ku ji aliyê qeyûm ve wek pêşnûmayekê tê ragihandin û daxuyaniyên ku dê di demeke nêz de pêşnûma bên sepandin ne rast in.

Emrah, anî ziman ku pêşnûmaya Pergala Raya Sivik di navbera salên 2010-2011'an de hatiye plankirin, di sala 2012'an de jî ketiye rojeva Şaredariya Bajarê Mezin û dihat fikirîn ku dê di sala 2013'an de çêkirina wê dest pê bike lê ev nehat erêkirin.

Emrah, anî ziman ku wan di sala 2013'an de cara ewil serî li İller Bankesiyê daye û diyar kir ku, pêşnûmaya wan a di sala 2014'an de buhayê wê zêdeyî 100 milyon TL bû, ji aliyê Teşkîlata Planê ya Dewletê ve hewaleyî Lijneya Planê ya Bilind (YPK)



hatiye kirin. Emrah, got YPK jî ji lijneyeka ku ji wezîran û serokwezîr ve pêk tê û wiha axivî: "Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê, xwest pêşnûma di sala 2015'an de di bernameyê de cih bigire. Hemû xitimandin jî, pêşnûmaya me ya çû YPK'ê li vir hat rawestandin. YPK ji bo sepandina pêşnûmayê çend caran nivîs şandin. Di nivîsên bi ruberî ahtin şandin de, ew pêşnûma bû ku ji aliyê Wezîrê Pêşvebirinê ve hatibû tesdîqkirin. Ji ber pêşnûma bi 100 milyon TL'yî û girêdayî krediya derveyî bû, ji Wezareta Pêşvebirinê pêşnûmayek hatibû xwestin. Rapora li wezaretê hatibû amadekirin her çi qas erênî bû jî, pêşnûmaya me li YPK'ê hat rawestandin."

Emrah, bertek nîşan daxuyaniya qeyûm Atîlla da û wiha axivî: "Ev pêşnûma bi awayekî cuda tê nîşandan. Dixwazin çavê mirovan boyax bikin. Bi derew merewan vê pêşnûmayê bi awayekî cuda nîşan didin. Me heqê 10 otobusên ku me sala çûyîn krîbûn jî dabû. Me pereyê wê razandibû Ofîsa Malzemeyan. Lê niha qeyûm dike malê xwe û dixwazin bi vî awayî gel bixapînin." Emrah, anî ziman ku pêşnûmaya ku bi salan ji aliyê serokwezîrtiyê ve hat astengkirin û piştî tayînkirina qeyûm bi lez û bez hat tesdîqkirin nayê qebûlkirin. *AMED - DÎHABER*



## Fikara qeyûm a ewlehiyê!



**Hamdî Bîlge Aktaş ê ku wek qeyûm tayînî Şaredariya Akdenîzê hat kirin bi hinceta "ewlehiyê" kevotên li ber şaredariyê dan birîn.**

**Qeymeqam Hamdî Bîlge Aktaş ê wekî qeyûm tayînî Şaredariya Akdenîzê ya Mêrsînê hat kirin pekanînên wekî qeyûmên li bajarên kurdan xist dewreyê. Qeyûmê ku berê jî peymana 11 xebatkarên şaredariyê fesh kir, panoya ku navên zarokên hatine qetilkirin li Ozgur Çocuk Parki rakir herî dawî jî bi hinceta "tehdîda ewlehiyê" kevotên li ber şaredariyê jê kir. Hate hînbûn ku hemû nebat û gihayên li ber şaredariyê li ser îhtîmala ku tiştek li hundirê wan bêcihkirin hatine jêkirin.**

**Karkeran diyar kirin ku fermana nebat xetere ye ji ber vê yekê jî nebatên kin bên çandin girtine. Li aliyê din bi tayînkirina qeyûm ve malpera fermî ya Şaredariya Akdenîzê hate girtin û malpera nû hate vekirin, hemû daneyên li malperê jî jî birine. MÊRSÎN**

## Hevşaredar hatin binçavkirin

Hevşaredarên Qilebanê Zeynep Uren û Yûnûs Urek hatin binçavkirin. Hevşaredarên Nisêbînê sewqî dozgeriyê kirin. Ji 10 kesên li Nisêbînê hatibûn binçavkirin jê 8 kesên din jî hatin girtin.

Hevşaredarên navçeya Qileban a Şirnexê Zeynep Uren û Yûnûs Urek serê sibê hatin binçavkirin. Hate hînbûn ku serê sibê polîsan bi ser mala herdu hevşaredaran de girt û ew binçavan kirin û birin midûriyeta polîsan. Hevşaredar Uren û Urek li Miduriyeta Polisan a Qilebanê tên ragirtin. Sedema binçavkirina wan nehat zanîn. *ŞIRNEX*



## 17 meh in dernaxin dadgehê



Parlamenterê HDP'ê yê Îzmîrê Muslum Dogan, 58 kesên ku di nava wan hevserokên HDP'ê yên Manîsayê jî hene û di çarçoveya operasyonê de hatine girtin ev 17 meh in dernaxînin dadgehê bir rojeva Meclîsê.

Dogan di pêşniyarpirsa ku xwest Wezîrê Dadê Adalet Bekîr Bozdag bersiva pirsên wî bide, diyar kir ku ev 17 meh û 20 rojin rêveberên HDP'ê hatine girtin û hêjî sewqî dadgehê ne hatine kirin û pirsa hinceta amadenekirina dozgeriya ya îdîanameyê kir. Dogan da zanîn ku ji ber tiştên tên jiyîn hestên wî yên dadê zirar dîtiye û dixwazin bi van bêhiqûqiyan xebatên HDP'ê astneg bikin. *ÎZMÎR*

## Hevşaredar Tunç hat girtin

Li navçeya Bêgirê ya Wanê polîsan di 13'ê Çile de Hevşaredarê Bêgirê Mehmet Ali Tunç jî di navde 17 kes binçav kiribûn û biribûn Midûriyeta Polîsan a Wanê.

Ji 17 kesên hatibûn binçav kirin jê Hevşaredarê Bêgirê Mehmet Alî Tunç jî di navde 7 kes bi îdîaya "endamtiya rêxistinê" û "Alîkarî dane rêxistinê" hatin girtin. Ji 17 kesan 10 kes jî li dadgehê bi şertê kontrola edlî serbest hatin berdan. Kesên hatin girtin wiha ne: Hevşaredarê Bêgirê Mehmet Alî Tunç, Bahattin Karagule, Dogan Başak, Halîl İbrahim Guler, Xebatkarê şaredariyê Yemlihan Akkuş û Ercan Dilmaç û Hevserokê DBP'a Bêgirê Mehemet Kaplan hatin girtin. *WAN*




## Pêdiviya kurdan bi siyaseta hevpar heye

Parlementerê Parlementoya Iraqê yê YNK'ê Arêz Abdullah têkildarî Kongreya Neteweyî ya Kurd axivî.

Abdullah diyar kir ku li çar perçeyên Kurdistanê li dijî gelê kurd şerekî taybet tê meşandin. Abdullah da xuyakirin ger li çar perçeyên Kurdistanê partî û rêxistinên kurd yekitiya xwe ava nekin, tu kes nikare pêşiya vî şerî bigire û ji ber vê yekê jî çareseriya şerê taybet ê ku li dijî gelê kurd tê meşandin yekitiya kurdan a çar perçeyên Kurdistanê ye.

Abdullah da zanîn ku hin alî girêdayî siyaseta dagirker in û wiha ev tişt gotin: "Îro hin siyasetmedarên kurd girêdayî



siyaseta dagirkeran siyasetê dikin. Ev jî astengiya ji bo Kongreya Netew a Kurd derdixe. Ger siyasetmedarên kurd li Kurdistanê bibin yek, pirsgirêkên ku îro di nav siyaseta kurdan de derdikevin pêş dê bên çareserkirin. Ji ber vê yekê jî pêwistiya avakirina zemîna siyaseta kurd heye. Ger ev zemîn bê avakirin, em ê hemû bibînin ku tişta ku neyê çareserkirin li holê namîne. Hemû tişt girêdayî avakirina zemînekî hevpar a siyaseta kurd e." *ENQERE -DÎHABER*

www.arsivakurd.org

## Suryaniyan TECRÎD şermezar kir

Pêkhateyên kurd û suryaniyên bajarê Dêrikê tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullan Ocalan şermezar kir û azadî ji Ocalan re xwest.

Pêkhateyên kurd û suryan ên herêma Dêrikê û Girkê Legê beşdarî meşa ji bo azadiya Ocalan bûn û li hemberî tecrîdê nerazîbûnên xwe anîn ziman. El-Qes Xaça Sor got ku divê li ser rewşa tenduristiyê ya Ocalan were rawestandin.

Seîd Xorxis ji ciwanên suryan siyaseta ku dewleta tirk li herêmê dimeşîne, şermezar kir û xwest ku Ocalan û girtiyên suryan serbest berdin. Osman Mihemed ê ji pêkhateya kurd jî got ku dê hemû gelên herêmê li ber xwe bidin û rêberê xwe azad bikin. Lema Ebdullah a kurd bi hevoka 'Bê serok jiyan nabe' azadiya Ocalan xwest û bang li rêxistinên navneteweyî û mirovî kir ku serdana Ocalan bê kirin û got ku ew ê ji bo azadiya Ocalan, çalakiyên xwe bidomînin. **DÊRIK**



# Ji bo NA'yê gelek sedem hene

**Hikumeta AKP'ê û Tayyîp Erdogan dixwazin bi pergala serokdewletiyê faşîzmê mayînde bikin. Karker, hiqûqnas û kedkaran destnîşan kir ku dê li dijî dîktatoriyê di referandûmê de bibêjin NA**

Karkeran diyar kir ku dê di referandûmê de ji bo guherandina makeqanûnê bibêjin 'Na' û sedemên ji bo çi dibêjin 'Na' rêz kirin.

Kedkarê buroyê Erkan Ogul anî ziman ku ji ber sererastkirinên hikumetê yên di qada jîngeha kedê de patron li hemberî karkeran tên xurtkirin, hemû deskeftiyên karkeran hatine binpêkirin û dê di referandûmê de bibêjin 'na' û wiha axivî: "Dema hûn dinihêrin her roj çewisandin, binpêkirina kedê pêk tê, hêdî hêdî hemû destkeftiyên me tên desteserkirin. Ji ber vê, êrîşên berê li dijî mafên me yên bidestketî, dê ji niha û pê de jî çêbin. Ji ber vê di 'Na'yê de xêrek heye. Hem di warê aborî de, hem jî di warê jiyanî de dê pirsgirêk mezin bibin, ji ber ez bawer nakim dê pirsgirêkên li Tirkiye û Kurdistanê bi rêveberiya kesekî bên çareserkirin, ez ê bibêjim Na."

Eylem Akçay a li Stenbolê wek kedkareke weşanxaneyê dixebite destnîşan kir ku heke li Tirkiyeyê, dê qanûneke bingehîn, sazûmaniyeke nû bê çêkirin divê xwedî mafên wekheviyê be. Akçay daxuyand ku ji bo pêşeroja Tirkiyeyê dewrî kesekî tenê neyê kirin dê di referandûbê de bibêje "Na".

Mert Okur ê li Stenbolê wek kedkarê weşanxaneyekê dixebite dest nîşan kir ku heke çarenûsa Tirkiyeyê bi destê kesekî tenê de bê berdan, dê ev xesareke cidî bide kedkar û dewlemendiyên welat û diyar kir ku ew ê bibêje "Na". Okur wiha got: "A rast ev 'Na' her tiştî vedibêje. Dema tu binihêrî, em cinayetên kar ên li Tirkiyeyê dizanin. Em dizanin bê jikaravêtin çi qas hêsan e. Rewşa birêxistinbûna karkerên li Tirkiyeyê li holê ye."

Okur da zanîn ku heke pêşniyar bi vî awayî di referandûmê re derbas bibe dê hemû mafên karkeran ên heyî jî ji holê bên rakirin û wiha domand: "Yanî welatek ji aliyê kesekî tenê ve bê birêvebirin, dê tenê rêxistinek hebe. Ev jî dê bi xwe re astengkirina birêxistinbûna karkeran bîne. Dê rê li ber behskirina mafên karkeran bê girtin, dê qad li karkeran bê tengkirin." *ENQERE*

## Ji rejîma dîkta re 'Na'




Rêveberiya Lijneya TMMOB'ê biryara derbarê pêvajoya guhertina makeqanûnê û referandumê de girtî bi daxuyaniyek nivîskî aşkera kir.

Di daxuyaniyê de hat diyarkirin ku bi guhertina qanûna bingehîn dê dadgeh, rêveberî û rêzikdanîn bikeve deste yek kesî de bi vê dê derbasî rejîma otorîter-totalîter bibin, dê bi vê re rêzikname û dadgehên ku bêalîbûna xwe windakirin ji holê bên rakirin.

Daxuyaniya Rêveberiya Lijneya TMMOB'ê ku banga "Na" dike wiha ye:"Di demokrasiyên azadperest û berfireh de hêman cudabûna fikran nayê nîqaşkirin. Qanûna bingehîn peymana civakê ye. Komkirina hemû aliyan di deste yek kesî de nayê qebûlkirin. Fesîh kirina parlamentoyê radestî kesekê kirin dîktatoriye. Dixwazin bi guhertinên qanûna bingehîn li welat dijberiya laîklîkbûnê ava bikin. Dixwazin rejîma dikta û pêkanîna serokatiyê ya fîîlî bixin ser bingehên qanûnî. Rêxistina me ji peymana ku dê dîktatoriyê bike sazîbûn dur, ji guhertinên qanûna bingehîn ku qanûna darbeya 12'yê Îlonê jî derbas dike re dibêje 'Na'. Dê hemû pêkhateyên TMMOB'ê di pêvajoya referandumê de ji bê guhertinê re beje 'Na'. Rêxistina me ji bo perpirsyariya xwe ya li hemberî gel û endamên xwe pêk bîne dê rêxistinên din bixe nava tevgerê û ji bo xeta têkoşîna hevpar ava bike dê bi rêxistinên ked û pîşeyê re tevbigere." *ENQERE*

## Tekane rê tevgerîna bi hev re ye

Seroka Giştî ya Halkevleriyê Oya Ersoy bal kişand ser referandûmê û der barê xebatên wan ên kampanyaya "Na"yê de axivî.


Ersoy, destnîşan kir ku bi taybetî nîqaşên der barê makeqanûnê ji gel hatine veşartin û diyar kir ku her wiha di şert û mercên OHAL'ê de çûyîna referandûmê jî nayê qebûlkirin û wiha axivî: "Heke der barê pirsgirêkên vî welatî de qanûneke bingehîn bihata çêkirin, dê îktîdara AKP'ê bi def û zirneyê li her derî ragihandana. Lê belê ji sedî 70'yê gel hay ji naveroka makeqanûnê tune ye."

Ersoy, destnîşan kir ku divê mirov xwe bigihîne kesên ku ji bo guherandina makeqanûna dibêjin "Erê" û ji wan bipirse ew ji bo dibêjin "Erê." Ersoy diyar kir ku eniya dibêje "Na" gelekî zelal e û yên dibêjin "Erê" diqilqilin. Ersoy, destnîşan kir ku di warê siyasî, civakî û dîrokî de eniya "Na"yê xurttir e, lê belê divê ev tev bigere û wiha got: "Tekane riya xelasbûna ji tarîtiyê tevgerîna bi hev re ye."

**ENQERE - DÎHABER**



## Ji tiştên zirarê didin civakê re NA



Hiqûqnasan diyar kir ku guhertinên makeqanûnê ji ber tirsa serokomarê tirk Tayyîp Erdogan û îktîdar dê bên darizandin, hatiye amadekirin û wiha got: "Em ji hemû tiştên ku zirarê didin civakê re dibêjin 'Na'."

Parêzer Kazim Bayraktar da zanîn ku îktîdar ji bo ku sûcên xwe veşêre dixwaze guhertinên makeqanûnê bixe meriyetê û wiha got: "Ji navendîbûnê zêdetir ji bo desthilatdariya zilamekî bingeha hiqûqî tê avakirin. Ev pergala dewletê jî faşîzm e."

Bayraktar da xuyakirin ku ji bo ku ji pergala serokdewletiyê re bibêje na, gelek sedemên civakê û ji bo tiştên zirarê didin civakê divê hemû bibêjin na." Parêzer Alîşan Şahîn anî ziman ku guhertinên niha hatine kirin tu eleqeya xwe bi hiqûqê re tune ye û ji ber vê yekê dê di referandûmê de bibêjin 'na'.

*ENQERE - DÎHABER*

## Komîsyona OHAL'ê xapandin e

Konfederasyona Sendîkayên Kedkarên Cemaweriyê (KESK), têkildarî avakirina Komîsyona OHAL'ê li Navenda Giştî ya KESK'ê civîna çapemeniyê pêk anî. Di civînê de endam û rêveberên KESK'ê û Hevserokê Giştî yê KESK'ê Lamî Ozgen amade bû.

Di civînê de Ozgen axivî û diyar kir ku avakirina Komîsyona OHAL'ê xapandin e. Ozgen, destnîşan kir ku wekî her carê ev jî xapandin e û wiha got: "Ev komîsyon xapandineke AKP'ê ya wekî hemû caran e. Tu armanc û derdê AKP'ê ya pirsgirêka mexdûran çareser bike, tune ye. Çima pêdivî bi vê komîsyonê dîtin. Dema komîsyona OHAL'ê ku AKP xist rojevê pir watedar e. Li 'Meclisa Parlamenteran a Konseya Ewropayê' dê der barê qanûna 'Birêvebirina saziyên demokratîk ên li Tirkiyeyê' ji bo ku bi lez û bez têxin rojevê ya na biçin dengdayînê. Çavdêrî û venêrîna Tirkiyeyê piştî AKP'ê bi hejmara 685'an a KHK'ê rawestand AKP ket nava hewldanan.

Ozgen, anî ziman ku heta niha zêdetirî 100 hezar kedkarên cemaweriyê ji peywirê hatine girtin û komîsyona ku ji 7 kesan pêk tê dê çawa li dosyaya hemû kesan binêre? Ozgen da zanîn ku armanca avakarina komîsyonê beriya referandûmê xapandin e. Ozgen diyar kir ku ew bi tenê vegera karmendên ku hatine îxrackirin qebûl nakin, her wiha divê ew mexdûriyeta wan jî bê çareserkirin. **ENQERE**


Rojeva Medya
27 Çile 2017 În

MEHMET ŞAHÎN

# OTORÎTEYA TÊKÇÛNÊ

Heke otorîteya navendî çare bûya dê Dewleta Osmanî têk neçûya.

Devleta Osmanî ji bo ku têk neçe erk û hêza navendî xurt kir. Her ku otorîteya navendî xurt kir, ew qasî têkçûna xwe hêsan û lezgîn kir.



Wisa xuya dike ku otorîteya navendî ya Tirkiyeyê têra xwe nake ku têkoşîna kurdan asteng û bê deng bike. Lewre niha ji bo ku têkoşîn û berxwedana kurdan a li çar parçeyên Kurdistanê asteng bike, wan bê statu, bê maf û bê hiqûq bihêle, otorîte û hemû erkan di yek destî de kom dikin.

**Heke mirov li pratîka AKP'ê ya sala dawîn binêre niyeta wê ya bi rêbazên demokratîk çareserkirina pirgirêkê nabîne. Wekî osmaniyan rêbaza kûrkirin û kangrenkirina pirsgirêkê daye ber xwe. Bi vê rêbazê hebûn û pêşeroja xwe jî xistiye nav xetereyê**

### ŞOREŞA FRANSÎ

Wekî ku tê zanîn piştî şoreşa fransî di cîhanê de bi pêşketina hişmendiya netewdewletê re civak û neteweyên di bin sîwana osmaniyan de, ji bo azadiya xwe dest bi serhildanan kir. Bi qutbûna gelek neteweyan ji dewleta osmanî, di demeke kin de bi windakirina erdên mezin re rû bi rû ma.

Ji bo astengkirin û pêşîlêgirtina xwestekên azadî û qutbûna civakan du vebijêrkên dewleta osmanî hebûn. An dê bi rêbazên demokratîk ev xwestek bibersivandana û temenê bihevre jiyînê dirêj bikira yan jî dê bi zext, zor û qetlîaman ev civak bitepisanda.

### BERSIVA OSMANIYAN

Rayedarên osmaniyan hemû otonomî û xweseriyên civakan ji holê rakirin. Hemû erk û hêz li navendê kom kirin. Di serî de civaka ermenî û gelek civak û çîn di qeltlîaman re derbas kirin. Heta wê demê rêveberên ku civakê ji xwe re diyar dikirin, dawî lê anîn, li şûna wan dewletê waliyên xwe erkdar kirin. Dewleta osmanî ew qasî pêşve çû ku mudaxale bi mîr û begên kurdan ku ji bav derbasî kur dibû jî kir û li şûna wan ji navendê mîr û beg diyar kirin û ji kurdan re şandin. Bi bacên giran û leşkeriya 14 salan pişta civakê şikand û xwestin civakê teslîm bigrin.

### ENCAMA TEPISANDINÊ

Encam çi bû; em hemû dizanin. Serhildan zêdetir bûn, ji osmaniyan qutbûn zêdetir bû, gelek civak zûtir gihaştin azadî û serxwebûna xwe. Osmaniayan nekarî xwe ji rizîn û belavbûnê rizgar bikin. Piştî Şerê Cîhana yê Yekemîn erdnîgariya osmanî hemû hate parvekirin. Di serdema dawîn a osmaniyan de tenê kurd di destê wan de mabûn. Li hemberî vê mudaxaleya navendî ya ku jiyana kurdan a xweser tune kir, bêguman kurd bê deng neman. Bersiva kurdan wekî her carê dîsa serhildan bû. Bersiva kurdan a yekemîn di sala 1806'an de bi serhildana Mîr Evdirehmanê Baban dest pê kir û bi dehan serhildanan 211 sal e ev pêvajo bê navber berdewam dike.

### RÊYÊN ÇARESERIYÊ

An dê bi hewldanên demokratbûnê netewedewleta otorîtera heyî veguherînin dewleteke demokratîk û hezar sal e civaka ku 3 tifaqên stratejîk pê re çêkirine û bi van tifaqan destkeftiyên mezin bi dest xistine wek birayê rasteqîn qebûl bike û hemû mafên biratiyê dê qebûl bike û hêza xwe xurttir û hebûna xwe qayimtir bike. Yan jî netewedewleta heyî, dê hemû pîvan, nirx û hiqûqê bin pê bike û li çar parçeyên Kurdistanê li dijî kurdan şerekî topyekûn îlan bike û hewl bide di serî de tevgera azadiyê û dînamîkên kurdan ên berxwedêr yek bi yek tune bike, qetlîam jî tê de, bi hemû rêbazên hovane civaka kurd bitepisîne.

### AKP ÇI DIKE?

Heke mirov li pratîka AKP'ê ya sala dawîn binêre niyeta wê ya bi rêbazên demokratîk çareserkirina pirgirêkê nabîne. Wekî osmaniyan rêbaza kûrkirin û kangrenkirina pirsgirêkê daye ber xwe. Bi vê rêbazê hebûn û pêşeroja xwe jî xistiye nav xetereyê.

Lewre guherîna makezagonê jî hewce ye di vê çarcoveyê de em bigirin dest. Hewce ye tifaqa AKP-MHP'ê ya ku hinek derdor fêm nakin û ji hêla Devlet Bahçelî ve jî bi zelalî nayê aşkerakirin di vê çarçoveyê de em bigirin dest.

Li gorî min MHP encax li ser tunekirina kurdan dikare piştgirî û alîkariyeke bêsînor bide AKP'ê û serokdewletiya Erdogan erê bike. Ango tiştê ku AKP û MHP'ê aniye gel hev, plana bi qetlîaman tunekirin û tasfiyekirina kurdan e. Lewre ji ber ku her du jî nikarin aşkera bibêjin me li ser tunekirina kurdan li hev kiriye, di îzahkirina vê tifaqê de gelek zehmetiyê dikêşin û hinek derûdor jî di fêmkirinê de zehmetiyê dikêşin.

### ERDOGAN Û BAHÇELÎ

Îhtîmaleke zêde Erdogan çûye rex Bahçelî û wiha gotiyê; "Ji nav vê pergala heyî Tevgera Azadiya Kurd derket û piştî 40 salan li çar parçeyan hatiye asteke wisa ku êdî bi vê pergala heyî, di nav pergala demokratîk û hiqûqî de ne pêkan e ku em bikarin pêşiyê lê bigirin û asteng bikin. An em ê rûnin û hemû mafên kurdan nas bikin, an jî hûn ê piştgiriyê bidin min em ê bi hev re pergalê biguherînin, erkdariyan hemûyan bidin destê min û min ji hesapdayînê rizgar bikin ez ê nirx, pîvan û hiqûqê hemû bin pê bikim û li çar parçeyên Kurdistanê li hemberî kurdan şerekî topyekûn îlan bikim, qetlîam jî tê de hewce bike xanî û bajarên kurdan bi serê wan de birûxînim, koka wan rakim, wan tune bikim û teslîm bigirim". Devlet Bahçelî jixwe ji ber ku ji duh ve razî bû, ev pêşniyar qebûl kir. Ev tifaqa bêoxir a ku salek e li Kurdistanê qetlîaman dike, bajaran wêran dike û Tirkiye aniye ber têkçûn û tunebûne, ev plana qirêjî ya AKP-MHP ê bi xwe ye.

### ÇÎROKA KURD Û TIRK

Bi kurtasî li gel tunekirin û tasfiyekirina kurdan têkçûna dewleta xwe jî daye ber çavan. Li vir ew pêkenoka navdar dikeve bîra mirov. "Biryara darvekirina yekî kurd û yekî tirk tê dayîn. Li gorî şêwazê xwestekên wan ên dawîn hatine pirsîn. Ji yê kurd pirsîne; kurd gotiye; Ez dixwazim dayika xwe bibînim. Ji yê tirk pirsîne; wî jî gotiye; Ez dixwazim ê kurd dayika xwe nebîne". Plana AKP-MHP jî dişibe vê pêkenokê.

Bi kurt û kurmancî di vê referandûmê de civakên Anatolya û yên Kurdistanê dê dahatûya (pêşeroja) xwe bidin dengdanê. An dê ji tunekirin û îmhakirina kurdan re bibêjin 'na' û jiyana xwe ya bihevre berdewam bikin, an jî dê vê plana bêoxir erê bikin û dawî li tifaqa kurd û tirkan a hezar salî bînin û hebûna dewleta xwe jî têxin nav xetereyê.

Ji ber ku kurd her tim di biratiyê de israrker in û ez bawer im wekî her carî dê di vê referandûmê de jî bi dengekî bilind bibêjin na. Lê di esasê xwe de yê ku baş bifikire û dengê xwe bi kar bîne di serî de civaka tirk û civakên Anatolyayê ne.

Lewre peywira sereke ya eniya biratiyê ku dibêjin na, ew e ku vê plana bêoxir teşhîr bikin û bi gel bidin fêmkirin ku gel wateya vê dengdanê bizanibe û li gorî wî dengê xwe bi kar bîne.

## Pêvajoya biryardayînê

**SERHILDANA** kurdan a dawîn ku di bin pêşengiya tevgera azadiyê de ev 40 sal e bê navber berdewam dike careke din dewleta tirk aniye ber biryardayînê. Ji bo dewleta tirk hezimkirina li gel ceribîna hemû rê û rêbazan ne astengkirin û berdewamkirina têkoşîna 40 salan, xwe birêxistinkirina 4 parçeyan, li Rojhilata Navîn wekî stêrkek biriqîna kurdan, bi hêzên cîhanî yên sereke re pêkhatina tifaqên stratejîk, di qada navneteweyî de qedirgirtin û payebilindbûna kurdan ne pêkan e. Lewre wekî osmaniyan dewleta tirk jî ji bo bihevrebûna kurd û tirkan hatiye ber biryardayîneke girîng. Ji bo "birayê" xwe yê kurd ê ku hezar sal e li gel hemû şertan jê neqetiyaye û qedera xwe pê re kiriye yek, dê biryarê bide.

## Rêbaza qetliyaman

**ZANABÛNA** me ya dîrokê ya hezar salan bi me dide fêmkirin ku vebijêrka yekemîn çareseriyeke aştiyane û birûmet di xwe de dihewîne, ya duyemîn jî pirsgirêkan kûrtir û kangren dike.



Mixabin gelek caran rayedar û erkdar ji bo parastina meqam û erka xwe dikarin dahatûya civakên xwe tarî û reş bikin. Lewre gelek caran kesên erkdar ên ku berjewendiyên xwe di ser berjewendiyên civakê re digirin, vebijêrka duyemîn hildibijêrin û civaka xwe jî ber bi felaketeke mezin ve dibin. Rayedarên osmanî jî mixabin çareserî di otorîteya navendî û ya hişk de dît. Xwestekên van civakan bi qatlîaman bersivandin.

## Tifaqa MHP-AKP'ê

**BI HEVKARÎ** û alîkariya AKP-MHP'ê ev guherîna makezagonê ya dawîn a ku hemû otorîte û erkan ji hikumeta navendî digirin didin destê yek kesî, hewldana osmaniyan a dawîn tîne bîra mirov. Osmaniyan bi otorîteya navendî û ya hişk nekarî xwe ji belavbûn û têkçûnê rizgar bike.

Berevajî vê yekê, têkçûna xwe lezgîntir kir. Heke di referandûmê de pêşî lê neyê girtin, dibe ku otorîteya hişk a yekkesî dawiyê li biratî û jiyana hevpar a hezar salan a kurd û tirkan bîne û hebûna dewleta tirk a dawîn jî bixe xetereyê.



## Mamlê; stêrkeke geş a çanda kurdan



**NAVENDA ÇAND Û HUNERÊ** ya Bêstûnê di 18'emîn salvegera koça dawîn a hunermendê navdar Mihemed Mamlê de daxuyaniyeke niviskî weşand û Mamlê bi bîr anî. Navendê diyar kir ku Mamlê stêrkeke geş a hunera gelê kurd e. Di daxuyaniyê de hat gotin ku ji bo civakan tiştê herî girîng çand û hunera wan e û ev tişt hat gotin: "Civakeke zindî bi çand û hunera xwe tê nasîn. Ji ber wê jî dema dagirker bixwazin welatekê bixin bin destê xwe, beriya her tiştî dest diavêjin çand û hunera wî gelî. Ji ber wê her dem erkên girîng û diyarker ên hunermendan li hemberî civaka xwe hene." Hunermend Mamlê strana xwe ya dawîn di sala 1994'an de qeyd kiriye. Mamlê di 23'yê çileya 1999'an de çû ser dilovaniya xwe. **HEWLÊR**

## Şanohezên biçûk dê kêfê bikin



Şanoya Zarokan a Zorlu bi lîstikên şanoyê yên zarokan ên bi navê 'Karlar Ulkesî' (Welatê Berfê) û 'Lunapark Gezegenî' (Gerestêrka Lunaparkê), di meha çileyê de gelek caran derket ser dikê. Şano pêşandanên xwe li Navenda Hunerên Performansê didomîne. Şanoya Zarokan a Zorlu ji sala 2003'yan vir ve bi zêdetirî hezar lîstikan derket pêşberî temaşevanan û li tevahiya Tirkiyeyê xwe gihand 700 hezar zarokan. Tê payîn ku lîstika 'Karlar Ulkesî' di 30 û 31'ê mehê de û lîstika 'Lunapark Gezegenî' jî di 26-27-28-29'ê çileyê de li Navenda Hunerên Performansê bên pêşandan. **STENBOL**

## Şeva Kêrên Dirêj



Lîstika 'Uzun Biçaklar Gecesî' (Şeva Kêrên Dirêj) a ku balê dikişîne ser şerê qirêjî, jiyana mirovên ku bandora vî şerî lê bûye, derdixe ser dikê. Şer bajaran dirûxîne, mirovan dikuje, xwezayê talan dike û ev sergo nakevin tu rûpelên dîrokê. Sergo ew tişt in ku nayên xwestin, nayên bikaranîn, kufikî bûne û nayên xwarin. Şer jî sergoyê diafirîne. Tiştên ku Şeva Kêrên Dirêj jî digire dest, sergoyên di şer de derketine holê ne û pirsa 'dê bi vê sergoyê çi bê kirin?' ji temaşevanan dipirse. Lîstik dê di navbera rojên 4 - 10 - 18 û 24'ê sibatê de li Fîl Adam saet di 20:00'an de bê pêşandan. **STENBOL**

# Newayên *rûmî û tirkî* distrên

NECLA DEMÎR / STENBOL - DÎHABER



Koma muzîkê ya Newayên Rûmî ya Stenbol û Îzmîrê, ji aliyê 3 jinên rûmî ve ên ji ber sedemên cuda hatin Stenbolê, hatiye avakirin. Vokalîsta komê Vassîlîkî Papageorgiou ye, Marîna Liontou-Mohamed li ûdê û Fotînî Kokkala jî li kanûnê dide. Ji bilî muzîkê, xala hevpar a her sê jinên rûmî ew e ku ji Yewnanistanê hatine û li Stenbolê bi cih bûne. Papageorgiou ya bi salan li Stenbolê tevî muzîkjenên tirk û yewnan xebatên muzîkê meşandin, niha bi du ziman stranan dibêje.

**ÇANDÊ ZINDÎ DIKIN**

Stranbêja jin Papageorgiou diyar kir ku koka malbata wê digihîje Îzmîr û girava Mîdîlliyê, lê ji ber Mubadeleyê ji Atînayê koçî Tirkiyeyê kiriye, beriya 23 salan bi temamî li Stenbolê bi cih bûye. Piştî gelek salan li Heybelîadayê dimîne, paşê berê xwe dide Beyogluyê. Papageorgiou, li gel nasnameya xwe ya muzîkjeniyê di heman demê de helbestvan e jî. Papageorgiou ya nîv bi rûmî û nîv bi tirkî diaxive, got ku dema ew nû hatibû Stenbolê tirkî û yewnanî ew qasî ne di nav hev de bûn, têkilî gelekî sar bûn û diyar kir ku her ku ciwanan hev du nas kir, muzîka tirkî û yewnanî jî nêzî hev bû û ev tişt got: "Em wek rûmiyekê, li Stenbolê kevneşopî û muzîka xwe zindî dikin. Divê muzîk neyê windakirin."

*Sê muzîkjenên jin ên rûmî ku ji Yewnanistanê hatin û li Stenbolê bi cih bûn, **newayên kevn ên di çanda rûmiyan** de bi salan hatine gotin, bi du zimanan; tirkî û rûmî digihînin guhdarên xwe*

Papageorgiou aşkera kir ku wê paşê Marîna Liontou-Mohamed û Fotînî Kokkala nas kirine û axaftina xwe wiha domand: "Fikreke xweş e ku her sê jin li ser dikê bin. Em vê hîs dikin û bi taybetî em li Stenbolê bi hev re derdikevin ser dikê û em ji vê hez dikin."

**NÛ HÎNÎ TIRKÎ BÛYE**

Marîna Liontou-Mohamed, dibêje ew sê sal e li Stenbolê ye û di komê de li ûdê dide. Marîna nû hînî tirkî bûye û zêde nikare xwe îfade bike û ji dêvla vê li têlên ûdê dide û xwe berdide ahenga wê.

Fotînî Kokkala jî li Yewnanistanê perwerdeya muzîkê dîtiye û hatiye Stenbolê. Kokkala di komê de li kanûnê dide û dibêje ew bi komên cuda re xebitiye û di heman demê de perwerdeya muzîkê jî dide.

# Bixwîne *û bi ya nû biguherîne*


Li Esenyurta Stenbolê pirtûkxaneyeke ku valahiya saziyên çand, huner û wêjeyê yên bi KHK'ê hatin girtin dadigire, hat vekirin. Pirtûkxaneya Wêjeyê ya Golgeyê bi şêwaza pevguherandinê danûstandina pirtûkan dike. Pirtûkxaneya ku li taxa Koyîçiyê di bin banê Civata Hunerê ya Golgeyê de hat vekirin, li benda xwendevanên xwe ye. Ji pirtûkên geşt, wêje, helbest, rojnivîsk û romanan bigire, her cure pirtûk li pirtûkxaneyê tên peydakirin û eleqeya ji bo pirtûkxanê jî zêde ye.


Rewşen Apaydin diyar kir ku li pirtûkxaneyan bi giranî pirtûkên wêje, çand û hunerê cih digirin û bi bîr xist ku bi KHK'an gelek sazî hatine girtin û wan xwestiye wê valahiyê bi vî awayî dagirin û wiha axivî: "Di demeke nêz de gelek saziyên çand û hunerê, weşanxane, rojname hatin girtin. Qadên bi zor û zehmetiyan hatin afirandin, hatin girtin. Afirandina qadên nû jî bû para me. Li vir a girîng ew e ku di şert û mercên wisa zehmet de zêdekirina qadên bi vîr rengî ye."

Endamê civatê Sînan Gokçe jî anî ziman ku ew hewl didin li hemû qadên hunerê tev bigerin û got ku li Esenyurtê ji bo milyoneke mirovan saziyên çand û hunerê kêm in û ev tişt anî ziman: "Ev der ne tenê pirtûkxane ye. Dema bixwazin ciwan dikarin tevî hevalên xwe werin sohbetên wêjeyî bikin, çaya xwe vexwin û pirtûkên ku dixwazin, dikarin peyda bikin."

**'BEŞDARÎ ZÊDE YE'**

Gokçe diyar kir ku armanca wan ew e ku ji dêvla ciwan demên xwe li kafeyên nargîle û înternetê derbas bikin, bila li cihên wisa baş bi xwendin û parvekirinê berdewam bikin û wiha got: "Di xebatên me yên heta niha de beşdarî baş e. Lê bi demê re hin pêdiviyên din jî xwe dan der; pêdiviya kovareke çand, huner û wêjeyê. Niha em wek pirtûkxane amadekariyên vê jî dikin. Em di wê baweriyê de ne ku wekî her demê divê ciwan li vir jî ji bo hilberînê tev bigerin." *STENBOL - DÎHABER*





## Hem pirtûkxane û hem jî dikan e



Dikana Sîneklî yek ji malên dîrokî yên li Mêrdînê ye û ji 1968'an heta niha dikana taxê ye û kesên ku tên vê dikanê jî dikarin pirtûkên xwe jî bistînin. Dikana Sîneklî ya ku 600 pirtûk tê de, pirtûkxaneya herî biçûk a bajêr e.

Mala dîrokî bi kevirên Mêrdînê û bi deriyê xwe yê kesk û navê xwe balê dikişîne. Mirovên tên danûstandinê, di heman demê de dikarin pirtûkên xwe jî bigirin. Ev salek e li dikanê pirtûk tên dayîn. Xwediyê dikanê di heman demê de kesên ku tên dikanê, pirtûkekê jî didê û divê heta 15 rojan dîsa teslîm bike. Dikana Sîneklî navê xwe ji pirtûka Halîde Edîp Adivar digire, li taxê hem peywira dikanê û hem jî ya pirtûkxaneyê dibîne.

Ciwanên ku li taxê dijîn, eleqeyeke mezin nîşanî dikanê didin. Li gel vê bala turîstan jî dikişîne. Xwediyê dikanê da zanîn ku bi muzeya Mêrdînê re nêzî 600 pirtûkan hatine berhevkirin û ev hejmar her ku çûye zêde bûye û got ku kiriyarên ku pirtûkan dibin zêdetir pirtûkan bi xwe re tînin. **MÊRDÎN - ŞOJIN**

## Ji çar parçeyan beşdarî mîhrîcanê bûn

Li navçeya Şarezor a Silêmaniyê 3'yemîn Mîhrîcana Dengên Cuda bi beşdariyeke xurt pêk hat. Mîhrîcan ji hêla Rêveberiya Rewşenbîrî û Hunerê ya Şarezûr û Rêxistina Hîwa ve hat lidarxistin. Di mîhrîcanê de hunermendên ji her çar parçeyên Kurdistanê amade bûn.

Rêveberê navendê Merîwan Tofîq diyar kir ku armanca wan ji vê mîhrîcanê ew e ku bikarin hunermendên her çar parçeyên Kurdistanê bigihînin hev û wiha axivî: "Em gelekî keyfxweş bûn ku welatî beşdarî mîhrîcanê bûn. Ev yek jî bû sedem ku sînor ji nava me rabin. Her çend Kurdistan parçe kiribin jî çalakiyên hunerî yên neteweyî didomin." Helbestvan Kenar Bêbak jî diyar kir ku xebatên çand û hunerê ji bo gelekî girîng in û ew jî wek helbestvanekî kurd piştgiriyê dide van xebatan. Bêbak aşkera kir ku beşdariya jinan jî girîng e û wiha got: "Nemaze beşdariya jinan pir girîng e. Ev jî di her alî de nêrîna wan a em jî dikarin wekî hemû mirovan erka xwe bi cih bînin, dide nîşan." Di dawiya mîhrîcanê de xelatên rêzdariyê li hunermendan hatin belavkirin. **GERMIYAN - ROJNEWS**



www.arsivakurd.org

# Ma zaf bedel da labelê peynî baş bîye

ABDURRAHMAN GOK / KOBANÊ – DÎHABER



Teşrîna verêna serra 2014 de Kobanê de ma mîyanê pêrodayîşî de raştê Apê Nemirî amebî. Her şer bi sembolanê xo yeno vîra merdimî. Şer bi xo bêro vîrîkerdiş zî sembolê şerî nînî vîrîkerdiş. 2 serrî ra pey ez reyna ameya Kobanê û seba ke ey reyna Apê Nemirî reyde sohbet bikera, ver bi Kanîya Kurdan kewta rayîr.

Wexto ke ma resayî Apê Nemir ma lingan ser de pêşwazî kerd û ma dawetê zereyî kerd.

Xoverdakaro extîyar Apê Nemiro ke 70 serreyî yo, mi verê cû şerê Kobanê de ey nas kerdbî. **O wext mîyanê betanîyêk de meterîsêk de xover dayêne.** O wext nizdîyê 2 deqa qisey kerdbî û ê qiseykerdişê ci bîbî destanêk

Kewtişê odeyî de 2 çarçewayê ke aliqnaye bîy, bala mi antî; yewin de fotografê lajê ci Osman û embazê ci Mahîro ke pîyê 6 domanan bî û hemleya Minbicî de şehîd kewtbî, estbî.

Çarçeweya dîyine de zî fotografê Raybêrê Şarê Kurd Abdullah Ocalan, Mizgîn Alan (Nefel), Mehmet Bakay (Karasungur Hîlvan), Yakup Hayker (Şerzan Hîlvan), Îbrahîm Vahap, Amed Cudî, Harun Bagok, Dijwar Colemêrg, Welat Debe, Bîrgul Çelîk (Edessa Girêsor) û Apê Nemirî estbî.

### 'DEYNDAR O' BINUSÊ

Ma dest bi qiseykerdişê kerd û şerwanêk dest bi vatişê rewşa şerî kerd. Apê Nemir senî ke qala şerî eşnawit, wina va: "Wexto ke ez nêşîya şer, şima şîyî an nêşîyî ez se bikera. Ez çend rojî verê şîya hetê embaze Sorxwîne (Xoverdakara Kobanê). Ma tayê qisey kerd û ya mi ra va 'ti çîyêk wazenî?' Mi zî va ez çîyêk nêwazena, labelê eke rojêk ez keyeyê xo de bimira, wa mezelê mi ser de 'deyndar bî' binusî."

### MA MINET NÊKENÎ

Dima ra ma tayê hîsin bîyî û Apê Nemir seba ke nêyî wedarno, torinê xo ra va 'çayêk bêşeker bikelêne, wa awe û dem yewbînan ra cîya bibî.' Dima ra Apê Nemir qala dîmenê ke ma di serrî verê antbî kerd û wina va: "O wext kesêk dîmenan temaşe keno û bi hawayêk xo resna hûmara telefonê mi û mi gêra. Wexto ke televîzyon de binê betanî de meterîsî mîyan de mi vîneno, xo bi xo vano 'ma ez zî merdim a' Kam se bikero, seba xo keno. Ma seba çîyêk ti kesî rê minet nêkenî. Labelê ez tena seba çîyêk qehiryena; ez birîndar bîya û mi temam nêkerd."

Dima ra polê xo yo çepî nîşanê ma da, seba ke parçe bîyo, platîn dekerdî mîyanê polî. Nê semedî ra Apê Nemir nêeşkeno polê xo têbido û va: "Platîn dekerdî polê mi û o zî çewt o. Ez ge-ge xo ra cigiryena û vana ez do sîlehî binê polê xo ra bibesta û şêra şer. Raştîya xo de destê mi tayê baş bîbî. Wexto ke mi eşnawit ke Qirkerdişê Kobanê de zaf kesî şehîd bîyî û lajê mi Osman zî birîndar bîbî, ez şîya mi reyna sîleh girewt û şer kerd. Dima ra erşawitî Vakur. Wexto ke ez Riha de amelîyat bîyêne, kişta mi de sedye ser de yew DAIŞî estbî û bi erebkî kurdan rê lengî çinayêne. Ti kes çîyêk fam nêkerdêne. Mi zî xo nêgirewt bi erebkî, kurdî û tirkî ci rê lengî çînayî. Na rewşe ser o zorê doktorî şî û polê mi wina çewt verda."

### CUYAYÎŞ WINA YO

Apê Nemir dima ra va 'embazan seba polê mi, mi erşawitî Silêmanî' û wina domna: "Ewja de rontgenê destê mi antî. Doktorî mi ra va (destê xo yê raştî erzeno ser singê xo û nîşanê ma dano) 'ma eşkenî destê to wina bestî.' Mi zî va eke ez wina bigêra do vajî 'no extîyar parsek gêreno û do pere bidî mi (hûyeno). Mi va çewt zî bibo, wa wina bimano. Çend rojî verê kombîyayîşê ma estbî, mi embazan ra va, embazî zaf hûyayî. Ma se bikerî, cuyayîş wina yo; ma do hem bihûyî û hem zî bibermî."

### APÊ NEMIR BÊMERD O

Apê Nemir dewam keno û wina va: "Şîyayîşê şima ra çend rojî dima, ez birîndar bîya. To dî mi şima ra vatbî 2 lajê mi zî şer kenî, raştîya xo de 2 nê, 3 lajê mi tîya de bîyî. Labelê xebera ma yewbînan ra çinêbî. Şima ra dima embaz Elî ame û telefonî da mi û va domananê xo bigêre. Mi zî va 'yê ke tîya de yî heme domanê min î, ez nêgerena'. Dima ra birazayêkê mi gêra û va 'xalo ma to televîzyon de dîyo'. Mi zî ci ra va 'şer giran o, telefon pade'. Aye roje ma 7-8 çete kiştbî û cenazeyê înan ziqaq de bî. Dima ra embazan werd amade kerdbî, veng da ma. Mi va 'şima şêrê, beno ke nêyî bêrî cenazeyanê xo bigirî, cok ra ez nobete tepîşena. Badê ez zî şîya werd, labelê wexto ke mi dî ke dem û awe yewbînan ra cîya kelênayî, mi zî henek kerd, mi va 'şima reyna sey tirkîyayijan çay viraşta' û ez agêraya meterîsê xo. O wext dêmek ez derîyaya. Mi vengêk eşnawit û dima ra mi polê xo de dejêk hîs kerd. Ez ver bi merdîvenan şîya û embazî resayî mi. Wexto ke mi dî ke embazî zaf hîsin bîyî, mi zî va 'Bicûyî xoverdayîşê Kobanê, Nemir bêmerd o û ez hûyaya. Dima ra embazan seba tedawî mi erşawit Vakur."

### FOTOGRAFÊ NEFELE

Wexto ke Apê Nemir qisey kerdêne, çimê mi fotografo ke ma meterîsê Nefele de antbî, gina. Eynî fotograf de Îbrahîm Vahap zî estbî; Trabzon ra seba seferberî amebî. Wexto ke ma ci reyde roportaj viraşt û 3 rojî dima şehîd kewtbî. Reyna fotografo bîn de zî Amed Cûdîyo ke pîyê xo reyde şer kerd, estbî. Apê Nemir wina dewam kerd: "O wext hêrîşê giranî estbî û dîmenê ke şima antbî, ê dîmenan de çimê mi ra hêsirî amebî war. Ê hêsirî zeyîfî ver nêbî. Dormeyê mi de ciwanê 18-20 serreyî şer kerdênê û şehîd kewtênê. Zaf zorê mi şîyênê û ez bermayêne. Ez 70 serreyî bîya û Nefela kişta mi de 21 serreyî bîye. Ez wextê çalakîya nobete ke sînorî ser de, bi guleyê gazî birîndar bîya, la kamî pers kerdêne 'mi vatênê dimpiştikî mi dayo'. Reyna hîna şer dest pênêkerdbî, ez linga xo ra birîndar bîya, la mi qala ci daxî nêkerd."

Apê Nemir wina va: "Tayê vanê eke lajê mi nêkewtênê şer, nêmerdêne. Xora lajê to nêşono, behr mîyan de nêxeniqîyeno? Ge-ge embazî mi reyde henek kenî û vanî 'çira ti nêmirenî?' Ez zî vana, şima mi bierzî topan ver zî ez nêmirena. Tena Homa eşkeno canê mi bigiro, çi DAIŞ û çi zî pîrbavê DAIŞî eşkeno bigiro. Osmanê lajê mi heta peynî Kobanê de şer kerd, çîk nêbî, la qirkerdiş de şehîd kewt."

Apê Nemir dima ra qala qirkerdişo ke 25ê hezîrane de bî, kerd: "Domanêk ame, destê xo ra birîndar bîbî. Wexto ke ma va se bîyo, va 'DAIŞî dayo mi ro'. Mi zî va 'embazan Sirrînî girewto, beno ke pîrozkerdiş de gule bi şaşî to ginayo'. Domanî va 'nê DAIŞ kewto bajarî mîyan'. Dima ra mi vengê guleyan goşdarî kerd û mi vengê sîlehê kanasî eşnawit. Êdî mi bawer kerd. Her çiqas zaf kesan de sîlehî estbî zî, vatbî qey embaz î, panênaybî. Tîya de nizdîyê 5 hezar merdimî estbî. Mi zî sîlehê xo girewt û dest bi panayîşî kerd. Eke ma gule nêreşanaynê, do bi wesayît bikewtênê mîyanê înan, hemînan bikiştênê. Dima ra şîyî berê sînorî ver de xo teqnayî. Lajê mi Osman zî sereyê xo ra gule weno û reseno şehadet."

Ma Apê Nemir û dayîka Şemsê ra xatir wazenî û înan ra aqityayî.

## Ma vatênê qey Hesen şî, la Osman şehîd bî

**CÎNÎYA APÊ NEMÎRÎ Dayîka Şemsêye zî qisey kerde û wina va: "Lajê mi Hesen sînorî ser de nobete tepiştêne. Berê sînor de wesayît teqnayî. Heme embazê ci şehîd kewtî, Hesen zî vir beno la çîyêk ci rê nêbeno. Embazê ci Comert û Mehmud hetê ci de şehîd kewtî. Ma seba Hesenî etiryayênê, la ma çi zanayêne ke Osman ver bi sînor şono û ewja de şehîd keweno. Domanêko birîndar ver bi keyeyê ma ame, mi birîna ci pak kerd. Dima ra wesayîtêk ver bi ma ameyêne. Lajê mi Huseyînî embazê xo ra va 'Bide piro keso ke yeno, yê çeteyan o' Embazê ci va 'nê, embaz î' Lajê mi sîlehî destê ci ra girewt û da piro. Wexto ke heto bîn ra zî embazan da piro, kesê ke mîyanê wesayîtî de bîyî xo teqnayî. Ma Hesen û Osmanî gêrayî, telefonê înan cewab nêda."**







Zifqêre

## Vatişê 'Nê' seba rijnayîşî gamêk o



Emrah Kelekçîer

Badê ke pêşnîyazê bedilnayîşê qanûno bingeyî Meclîs ra derbaz bî û erşawîya Serokkomarî ver, nika Tirkîya de amadekarîya referandûmî yeno kerdiş. Heta nika heme partîyê fikrê xo yê referandûmî aşkere kerdî.

Verfekê hukmatî û hetkarê Serekwezîrê Tirkîya Numan Kurtulmuşî çend rojî verê cû wexto ke îzehet dayêne çapemenî, seba referandûmî wina vatêne: "Ma bawer kenî ke no peşnîyaz do referandûmî de bêro qebulkerdiş. Eke netîceyê referandûmî de bêro qebulkerdiş, o wext do vengê rêxistinanê teroran bibirîyo, eke wina nêbo beno ke bombeyî biteqyî û merdimî bi suîkastan bêrî kiştiş." Kurtulmuşî bi hawayo aşkere şarî tehdît kerd. Merdim eşkeno vajo ke no eynî wextî de îtîrafkerdişêk o. Yanî nê hêrişê ke yenî kerdiş, bi destê hukmatî yan zî çarçeweya zanayîşê hukmatî de benî, no îzehet zî îtîrafê ci yo.

Xora no îzehetê tehdîtî yê sifteyîn nîyo; yeno zanayîş ke wexto ke hukmatî netîceyê weçînayîşê 7ê hezîrane nêecibnabî û qerarê weçînayîşî girewtbî, weçînayîşê 1ê teşrîna peyêne ra ver, Serekwezîro kehen Ahmet Davutogluyî bajarê Wanî de bi hawayo aşkere vatbî 'eke ma nêrî îqtîdar do Torosê Sipîyî reyna bivejyî rasteyan.' Reyna Bînalî Yildirimî zî eynî çarçewa de qisey kerdbî û şarî tehdît kerdbî. Seba ke çîyo ke no hukmat vajo nêmendo, şarî tehdît kenî. Wexto ke tehdît kenî zî çîyê ke bin hişê înan de yî, ê zî vejîyenî teber.

No hukmat, hukmatê tehdîtî yo û krîz û kaosî ser ro estena xo domneno. Bitaybetî nê çend serranê peyênan de no tarz esas gêno. Duştê hêriş û şîddetî zêde keno, bi no hawa kaos û krîzêko gird vejeno, dima ra dest erzeno, sey ke çareser kerdo, nîşan dano. Yanî hem dano piro û hem zî weş keno. Hêrişê ke rojawan de kurdan rê bîyêne, teqîyayîşê ke Pirsûs, Anqara, Amed, Edene, Mersîn, Stenbol û sewbîna zaf cayan de bîyî, heme zî bi destê hukmatê yan zî çarçeweya zanayîşê hukmatî de bî. Heta goreyê mi teşebusê derbe daxî bi têkilîya hukmatî de bî, neke kamcîn hetê dinya de ameyo dîyayîş ke hukmatêk derbe ra dima hende bihêz bîyo û hemleya derbe hende açarnayo hetê xo ra.

Heto bîn ra cepheyo ke vera hukmatî de her ke şono beno hîra esto û rayberîya nê cepheyî zî kurdî kenî. No cephe do prosesê referandûmî de qederê Tirkîya dîyar bikero. No cephe do vera Sîstemê Serekî ke Tirkîya de vernîya diktatorî akeno û dormeyê Erdoganî de zirxêko gird awan keno de erjê merdimîye paweno. Çimkî hukmato ke heme erjê merdimîye girewto/gêno bin lingan, esto û çi ehlaq û çi zî huqûq û sewbîna çî verdayo. Vera nêyî de vindetiş, ancax referandûm de bi vatişê 'nê' mumkin o.

Nê referandûmî de sedemê vatişê 'nê' xeylî zaf î; seba qedênayîşê diktatorî, krîzê ekonomî, neheqî, zext, bêehlaqî û sewbîna xeylê çîyê ke ganî bêrî bedilnayîş, estî. Çimkî no pêşnîyazê bedilnayîşê qanûno bingeyî yê 12ê êlule ra xirabêr o. Çîyê ke o wext bi destê Kenan Evrenî nêameybî kerdiş, ewro bi destê Erdoganî yenî kerdiş. Cok ra ganî her kes nêyî ra vajo nê û seba nêyî zî dormeyê xo reyde mîyanê têkilî de bibo.

# Mergê 12 kesan kenî babeta bazarî



MERKEZÊ XEBERAN


Sey ke yeno zanayîş 19ê kanûna 2000 de Hepisxaneyê Bayrampaşa de bin nameyê 'Agêrayîşê Cuye' de qetlîyamêk virazîyabî û 12 kesî bi hawayo hov amebî qetilkerdiş. Goreyê îzehetê Şaredarîya AKPyî yê Bayrampaşa ser erdê Hepisxaneyê Bayrampaşa ke 150 hezar donim erd ser de awan beno de do awanîyê modernî bivirazyî.

Şaredarîya AKPyî yê Bayrampaşa ser keyepelê xo yê înternetî de îzehetêk pare kerde û îzehet de yeno vatiş ke ser erdê hepisxaneyî de awanî, sînema, tîyatro, sergî, tîcaret, kitabxane, rayîrê bîsîklete, kreş û cafeyî do bêrî viraştiş. Şaredarîya Bayrampaşa ser keyepelê xo yê înternetî de reklamê awanîyan bi fotografanê operasyonê 'Agêrayîşê Cuye' dayî naskerdene.

Goreyê xebera Rojnameyê Cumhurîyetî, Mehkemeya Îdareyî ya 13. ya Stenbolî derheqê projeyî de 4 reyî qerarê vindarnayîşî dayo. Goreyê qerarê mehkeme erazîyê projeyî goreyê pîvanê bajarî nîyî. Projeyê awanîyan serra 2011 de ame amadekerdiş.

Şaredarîya Bayrampaşa zî naskerdişê projeyî bi 12 kesê ke hepisxane de merdbî, kerd. Projeyê awanîyan bi 12 ripelan ra pê yeno. Proje sîteyê şaredarî de nizdîyê serrêk ver bin nameyê 'erazîyê hepisxaneyo kehen beno merkezê cuya newe' ameyo parekerdiş. Komele û sazîyê sîvîl seba îptalkerişê proje sere dayî mehkeme û waştişê xo yê îptalkerdişî ardî ziwan.

# Nêeşkenî karê xo bikerî



13ê adara 2016 de Gever de qedexeyê tebervejîyayîşî amebî îlankerdiş û dima ra zî her taxe û cadeyê Geverî de hêzê dewlete ameybî bicakerdiş. Dewlete ewja de 79 rojan bi heme îmkan û teknolojîyê xo heriş kerde. Operasyonan de bi seyan dikanî ameybî rijnayîş û esnafî bi aşman nêeşkayî dikananê xo biakerî û bi no hawa zerar kerdî.

Babete ser o Serekê Odaya Esnaf û Hunermendan Îrfan Sarîyî qisey kerd.

**BAJAR DE ESNAFÎ NÊMENDÎ**

Îrfan Sarîyî qala rewşa esnafê bajarî kerd û mexdurîyetê esnafan ard ziwan: "Seba qedênayîşê mexdurîyetê esnafan heta nika ti game nêame eştiş. Bin nameyê pawitişê dare û vilikan de miqatekerdişê heywanan û zîret zî aver nêşono. Gever de esnafî her het ra zirar vînenî. Wexto ke ma Wezîr, Walî û Qeymekaman zî vînenî, problemanê bajar û esnafan înan rê vanî. La seba qedênayîşê probleman çîyêk nîno kerdiş."

**KRÎZ HER KE ŞONO KÛR BENO**

Îrfan Sarîyî dîyar kerd ke fehmo ke derheqê Gever de yeno awankerdiş beno sebebê kêmîbîyayîşê îthalat û îxracatî û qiseykerdişê xo wina qedêna: "Nika Berê Sînorî yê Esendere ya ke mabênê Gever û Îran de yo, tede kar nêbeno. Seba ke zere û teberê sînorî de polîtîkayê şerî yenê meşnayîş, krîzê Geverî her ke şono hîna zaf kûr beno. Fekê berê her dikanî de wesayîtê zirxin û polîsî estî. Gever de çend aşmî çimê esnafan ver de mîyanê panzerî ra gule ame reşanayîş û netîceyî hedîseyî de yewê xo esnaf 4 kesî ameybî qetilkerdiş. Gever de seba ke ewleyîya ganî çin a ti kes nêewtaneno bivejîyo teber. Ganî polîsî merkezê sûke ra bêrî antiş û esnafî bieşkî karê xo bikerî."

**COLEMÊRG - DÎHABER**

# Tirkîya do ver bi felaket şera

**Prof. Dr. Hayrî Kozanogluyî derheqê 'merkezê cazîbe' yê ke yeno vatiş ke do polîtîkayê leşkerî ra dîma bikewî dewre de wina va: "Nê, referandumî ra ver teşebusê ke xo bi hawayo şîrin nawitişî yo. Şert û mercê OHALî de bi zorî kerdişê sermayegozarî netîce nêgêno"**

NECLA DEMÎR / STENBOL - DÎHABER

Verê cû amebî vatiş ke polîtîkayê leşkerî ke 24ê temuze ra dima hetê hukmatî ra amebî meşnayîş ra dima do 'Merkezê Cazîbe' bêrî awankerdiş. Na çarçewa de Serekwezîr Bînalî Yildirimî zî 24ê çileyî de Şinaseyê Destpêke ya Programê Merkezê Cazîbe aşkere kerd. 37 serrî verê eynî roje de derbeya leşkerî ya 12ê elûle ra ver 'programê îstîkrarî' amebî aşkerekerdiş. Bi nê programî heme qezencê karkeran amebî xespkerdiş.

Prof. Dr. Ekonomîst Hayrî Kozanogluyî 'programê îstîkrarî' û 'merkezê cazîbe' da têver û vînayîşê xo ard ziwan.

Prof. Dr. Kozanogluyî dîyar kerd ke bingeyê na hemle de tena înşaat est o û lazimîyê merdimanê herême rê çîyêk nêano. Kozanogluyî va referandûmî ra ver vistişê dewre yê na hemle, yeno manaya ke hukmat wazeno xo çimê şarî de şîrin binawno.

**VER BI FELAKET ŞONA**

Kozanogluyî dewamê qiseykerdişê xo de va 'programê îstîkrarî' yê 1980î, programo ke hetê ÎMF, Bankaya Dinya û sewbîna dezgehê fînansî yê mîyanneteweyî ra ameyêne destekkerdiş û hedefê ci de vilakerdişê rêxistinanê sendîkayan estbî' û qiseykerdişê xo wina domna: "Nika şîyayîşê hukmatî hetê sermaye de ver bi felaketî de yo, seba sermaye çareserî nêano. Nimûneya ci ya tewr baş hetê turîzmî de ya. Sera 35-40 kêmîbîyayîşê ameyeyê turîzmî bî sebeb ke sermayeya xerîbe nêro welat û sîstem no ser ro kewto tengasî. Eke no referandûm de şar hem Sîstemê Serekî û hem zî na polîtîkaya ekonomîke ra nêvajî nê, çareserîyêk nîno dîyayîş. Goreyê mi o wext welat do ver bi felaketî bikirancîyo."



**NETÎCE NÊGENO**

Kozanogluyî dewamê qiseykerdişê xo de programo ke sey dewamê 'îstîkrarê ekonomîkî' yeno dîyayîş û hewl dano ke cîyayî orte ra wedarno zî rexne kerd' û wina dewam kerd: "Her kes wazeno ke şarê herême mîyanê keyeyê xo de bi hawayo biewle bişînbo debara xo bikero û bireso firsendanê perwerde, kar û weşî. Labelê heta ke proseêko aştî nêro awankerdiş, hemleyê ke bêrî kerdiş zî ti netîce nêgenî. Merdimî seba ke bişînbî vernîya xo biveynî, ganî ewleyî bêro girewtiş û çîyê ke dîyar nîyî zî ganî bêrî dîyarkerdiş. Wexto ke nê ameyî kerdiş ra dima ancax o wext hemleyê ekonomîkî eşkenî bêrî kerdiş. Nika şert û mercê nêyî hetê polîtîk û ewleyî de nêameyî awankerdiş, cok ra şert û mercê OHALî de bi zorî kerdişê sermayegozarî netîce nêgeno. Heto bîn ra proseêko winasî de hukmatê sermayegozarîyêk bi 19 mîlyar û 600 lîreyî senî virazeno?"

# Ganî cinîyî bextwaştoxî nêbî babeta nizdîbîyayîşê polîtîkî



Şero mîyanên yê Sûrîye ver yê ke tewr zêde tesîr bîyî, cinî yî. Cinîyê ke şerî ver mecbûr mendî ke welatê xo ra koç bikerî, reyna sîyaseto ke denetîmê camêrdî de yeno kerdiş de vînî benî, nînî dîyayîş.

Babete ser o akademîsyena ke vatbî 'ez nêbena ortaxê nê sucî' û bi Qerarnameyê Hukmê Qanûnî karî ra amebî îxraçkerdiş, Prof. Dr. Ferîde Aksu Tanike qisey kerde.

Tanike va 'problemê tewr bingeyî yê cinîyê bextwaştoxan nînî çareserkerdiş' û qiseykerdişê xo wina domnaye: "Mîyanê nê probleman de sifteyîn ewleyî ya. Dima ra miqatebîyayîş û sewbîna problemî yenî. Çi heyf ke bextwaştoxî mîyanê keyeyî de raştê şîddeto cinsî, tacîz û tecawizî yenî. Cinîyê bextwaştoxî wextê koçkerdişî de bazaranê koleyan de yenî rotiş."

**TI TEMÎNATÊ ÎNAN ÇIN O**

Tanike dewamê qiseykerdişê xo de va 'tena Sûrîye û welatanê Rojhelato Mîyanên de nê, Dîlok de zî tîcaretê cinîyan yeno kerdiş' û wina dewam kerde: "No het de xeylê zanayîşî resayî ma. Resayîşê nê cinîyan yê xizmetanê weşîyan zî xeylê zehmetin o. Kultur û musayîşê cuye yê merdiman heme raştê travmayêk yenî. Keyeyî parçe benî, ma vînenî ke nimûneyê keyeyê ke pî merdo, domanî vînî bîyî û dayîke tena têkoşînê cuyayîşî dana, estî. Orte de dagîrkerîyêka girde ya kede esta. Merdimî cayanê zaf xirabinan de bi kîrayanê zaf berzan manenî û vera vêşanî de têkoşîn danî."

**GANÎ WINA NÊBO**

Tanike peynîya qiseykerdişê xo de bale ante şert û mercê weşî ser û qiseykerdişê xo wina qedênaye: "Ganî her şert de bextwaştoxan rê bêrî biabîy. Çarçeweya dewleta sosyal de lazimî bi polîtîkayanê winasî esta. Ganî cinîyî bexwaştoxî nêbî babeta nizdîbîyayîşê polîtîkan û problemê înan çareser bibî."

***STENBOL - DÎHABER***

www.arsivakurdi.org

ROJEVA Medya
27 Çile În 2017

**ROJEVA MEDYA**
**Ararat Basın - Yayın**
**Reklamcılık Adına**

İmtiyaz Sahibi:
**Murat SEKMEN**

Yazı İşleri Müdürü:
**Mehmet Çetin ALTUN**
***Yönetim Yeri:*** Kooperatifler
Mahallesi Akkoyunlu
4. Sokak Sarıca Apt. 2/3
***Yenişehir-DİYARBAKIR***

***Tel:*** 0 (412) 224 35 93
Baskı ***(ÇAP):***
***İstanbul:*** Gün Matbaacılık,
Reklam, Film, Basım, Yayın,
Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Telsizler
Mevkii Beşyol Mah.

Akasya Sok. ***No:*** 23/A
***Küçükçekmece İSTANBUL***
***Tel:*** 0 (212) 580 63 81
***Adana:*** Arslan Güneydogu
Gazetecilik,
Matbaacilik, Kağıtçılık

Yeni Doğan Mah. 2108 Sok.
***No:***13/A ***Yüreğir / ADANA***
***Tel:***0 (322) 346 03 71-72
Yaygın Süreli Yayın
***e mail:***
rojevamedya@hotmail.com

# Cewhera çar parçeyên Kurdistanê:
# Şehîdgeha Kobanê

SÎNAN DENÎZ / KOBANÊ - ANF

Berxwedan û serkeftina Kobanê ya ku bi tîpên zêrîn li dîroka berxwedanê ya mirovahiyê hat nivîsandin, bi lehengiyeke bêhempa ya xort û jinên kurd afirî. Kobanê bi berxwedana xwe bû rê û rêgeha mirovahiyê. Mirovahî bi hestên heyrantiyê bû destek ji vê berxwedanê re. Di serî de li seranserê sînorê Kobanê ji bo berxwedanê, gelê bakurê Kurdistanê bû piştevan.

Yên ku qîma xwe bi piştevaniya li ser sînor neanî, berê xwe da Kobanê û tev li berxwedana destanî ya ku di oxira wê de gelek can û beden hatin dayîn. Ev bedenên berxwedêran ên ku di oxira destanê de hatin dayîn, li şehîdgeha Kobanê bûne yek beden û hêviyan her zindî dikin.

Şehîdgeha Kobanê piştî Şoreşa Rojava ya 19'ê Tîmeha 2012'an ava bû. Bi pêşengiya Saziya Malbatên Şehîdan navê Şehîd Dîcle li şehîdgehê hat kirin. Dîcle jî mîna bi hezaran xort û jinên kurd, jineke ciwan a Kobanê bû ku bi dildariya têkoşîna azadiyê tev li nava refên PKK'ê bûbû. Dîcle ji gundê Koralî yê Kobanê bû û gerîlaya destpêkê ya jin bû ku ji Rojavayê Kurdistanê di nav refên ARGK'ê de jiyana xwe ji dest dabû.

**ŞEHÎDGEHA DÎCLE**

Dîcle di sala 1989'an de li çiyayên Bakurê Kurdistanê di şerekî de jiyana xwe ji dest da. Cenazeyê wê hê li bendê ye ku li axa lê ji dayik bûye were veşartin. Şehîdgeha ku di sala 2012'an de ava bû, niha zêdetirî hezar şervanan di hembêza xwe de radizîne. Li Şehîdgehê ewil 4 cenaze hatibûn veşartin.

Yek jê yê gerîla Dunya bû ku li Bakurê Kurdistanê jiyana xwe ji dest da û 3 jî cenazeyên endamên asayîşê bûn. Di sala destpêkê de rejîma Baasê cenaze rakir, lê gel di biryara xwe de israr kir. Di sala 2012'an de jî piştî ku gel dest bi rêvebirina xwe bi xwe kir, li Şehîdgeha Şehîd Dîcle êdî cenazeyên gerîla û şervanên ku di têkoşîna azadiyê de jiyana xwe ji dest da, hatin veşartin.

Piraniya şervanên di berxwedana Kobanê de jiyana xwe ji dest daye, li Şehîdgeha Dîcle radizên. Di dema êrîşa çeteyan a li dijî Kobanê de, ji ber ku herêma şehîdgehê kete destê çeteyan, cenazeyên şervanên di şer de jiyana xwe ji dest da, li herêma çeperên şer dihatin veşartin.

**BAJARÊ ŞEHÎDGEHAN**

Di dema berxwedana Kobanê de sê şehîdgeh li nêzî çeperan hatin avakirin. Serokê Saziya Malbatên Şehîdan a Kobanê Arîf Balî wiha qala vê pêvajoyê dike; "Li Kobanê di destpêkê de cenazeyên gerîlayên ku li çiyayên Bakurê Kurdistanê jiyana xwe ji dest da, hebûn. Ew li goristana Kobanê ya giştî veşartibûn. Li gundan jî şehîd







hebûn. Piştî şoreşa 2012'an, biryar hat dayîn ku li kantonan, şehîd li şehîdgehekê bên veşartin.

Şerê sala 2013'an dest pê kir. Şehîdê destpêkê hevalê Mehmûd bû. Hevalê Dilovan hebû, yên di destpêkê de hatin veşartin, ew bûn. Ev şehîdgeh bi wan dest pê kir. Bi zêdebûna şehîdên şoreşê re qad berfireh bû. Dema êrîşên çeteyên DAIŞ'ê dest pê kirin,



Di berxwedana Kobanê de bi sedan şervanên azadiyê canê xwe feda kir. Her yek ji devereke Kurdistanê rabûbû û berê xwe dabû vê berxwedana rûmetê. Şehîdgeha Kobanê jî îro ji wan cangoriyan re malovaniyê dike.

şehîdê dawîn ê me li şehîdgehê veşart, şervanekî ereb bû. Êrîşên DAIŞ'ê dest pê kirin.

DAIŞ bi guleyan bi ser me de dihat. Piştre şehîd li aliyê deriyê sînor ê Murşîtpinarê hatin veşartin. Dema em neçar man Şehîdgeha Şehîd Dîcle berdin, hingî me ji YPG, YPJ û Asayîşê 200 şehîd veşartibûn. Di dema şerê bajaran de, di cotmeha 2014'an de li nava bajêr şehîdgeh hatin çêkirin. Li şehîdgeha destpêkê tevî Omer Qamişlo 19 şervan hatin veşartin. Li nêzî deriyê sînor bû.

**DEFINKIRINA ŞEHÎDAN**

Di dema şer de 3 şehîdgeh bi vî rengî çêbûn. Carinan me kevir ji nav erdan, carinan jî li ber deriyên malan dianîn. Dema DAIŞ bi şehîdgehekê dihesiya, yekser top diavêtin wê derê. Me jî dest ji wir berdida û em diçûn cihekî dinê. Li her sê şehîdgehên di dema şerê bajêr de hatin çêkirin, me cenazeyên 250 şervanan veşartin.

Dema deriyê sînor vekirî bû, me şehîd bi giranî derbasî bakurê Kurdistanê dikirin, malbatan jî ji wir digirtin. Zarokên gelê bakurê Kurdistanê ji aliyê malbatan ve dihatin girtin. Ji bo şehîdên ji Kobanê li Pirsûsê jî şehîdgehek hate avakirin.

Di destpêkê de me şehîd dişûştin, kincên wan jê dikirin, tevî kincên nû cenaze bi naylonan dipêçan û bi vî rengî dispart axê. Bi vî rengî, dema di rojên pêş de malbatan bixwesta, me dikarîbû cenaze derxista û bida. Piştre me êdî şehîd bi kincên wan spartin axê. Bêguman me birînên wan û xwîna wan paqij dikirin.

**ŞEHÎDGEHÊN CEWHERÊ**

Piştî ku berxwedana Kobanê bi ser ket, di Newroza 2015'an de me biryar da ku cenazeyan rakin Şehîdgeha Şehîd Dîcle. Di 4'ê Nîsanê de me dest bi birina cenazeyan kir. Li gelemperiya Rojava 14 şehîdgeh, li Kobanê jî di rewşa heyî de 3 şehîdgeh hene. Her du şehîdgehên din Şehîdgeha Komkujî û ya Berbotan in. Ji bo gelê ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê ve hate kuştin, hatine çêkirin.

Li Şehîdgeha Dîcleyê niha bi giştî 1025 şehîd hene. 777 ji van şehîdan ji Rojava, 167 ji bakurê Kurdistanê, 20 ji rojhilatê Kurdistanê û 5 jî ji başûrê Kurdistanê ne. Her wiha 56 şervanên ereb û cenazeyê şervanekî MLKP'ê lê ne.

Ji van şehîdan 756 jê şervanên YPG'ê, 138 jê şervanên YPJ'ê, 13 jê gerîlayên HPG'ê, 28 jê welatparêz û 56 jî şervanên QSD'ê ne. Ev yek jî nîşan dide ku Şehîdgeha Kobanê cewhera gelê kurd, cewhera gelên Rojhilata Navîn e."

**ŞEHÎDGEH TÊN NÛKIRIN**

Xebata li şehîdgehan ku di sala 2012'an de dest pê kir û bi berxwedana Kobanê dewam kir, hê jî didome. Saziya Malbatên Şehîdan ji şehîdgehan berpirsyar e. Lê belê xebatên avakirina wê ji aliyê Komîteya Jinûveavakirinê ya Kobanê ve tên kirin.

Endamê Saziya Malbatên Şehîdan Mûhammed Îsmaîl Berxbatan qala rewşa nû ya Şehîgehan kir: "Li şehîdgehê kedeke mezin a Şehîd Şîrîn heye. Di berfirehkirin, mezinkirin û xebatên avakirinê de kedeke xwe ya mezin heye. Dema Şehîd Şîrîn avakirina şehîdgehê dewr girt, ev kar gelekî zû çû serî."

Berxbatan da xuyakirin ku ew amadekariyan dikin ku goran tamîr bikin, bi mermeran bigirin, cihekî muzeyê li nava şehîdgehê çêkin, cihê îbadetê amade bikin û bîrdariyên ku çar parçeyên Kurdistanê temsîl bikin, çêkin.



www.arsivakurd.org